

# ROJA NÛ

*kovara huneri çandi û edebi*



## NAVEROK

Problemên Kurdnasiyê yên Paşwextiyê . . . . .	3
Komela Kurd Bo Belavkirna Zanine . . . . .	5
Civin Jî Bo Serhildana Şêx Seid -1925 . . . . .	8
Kongra PSKT'ê a Duwemin Pêkhat . . . . .	9
Kurdistan Warê Ciwarbûna Mirovteyê ye Heri Kevn . . . . .	10
Pirtûkxana Kurdi Lî Sovyetistanê Her Devlementir Dibe . . . . .	12
Festivala Munihê û Rureşiya Hukumeta Türk . . . . .	15
Festivala Cîwan û Xwendekarên Cihanê Pêkhat . . . . .	16
Riya Cejnê Nine Riya Şoreşe . . . . .	20
Me Welatparêzeki Kurd Winda Kir . . . . .	21
Dirokzaniya Tîrkan Derheqa Kurdan û Pirsa Kurdan da . . . . .	22
Prof. Farizov . . . . .	23
Kampanyek . . . . .	24
Dînya, Qeder, Axiret . . . . .	25
Du Evsane (Bî Zimanê Kurdi) . . . . .	28
Jî Nav Weşanan . . . . .	30



TU JÎ TÊDA  
BEŞDAR  
BE !

\* Wextê beşdarbûnê  
heta meha 12'a hatiye dirêjkirin.

Sal : 7  
Hejmar : 53

**XWEDİ : KOMKAR - Swêd**  
**BERPIRSIYAR : Şêroyê BOTAN**  
**NAVNIŞAN : Karlbergsv. 32 B. nb**  
113 27 Stockholm  
**TELEFON : 08/ 32 82 51**  
**HESAP NO : PG. 458980 - 0**


**UTGIVARE : Svensk-Kurdiska**  
Arbetar Föreningen

**ANSVARIG UTGIVARE : Ş. BOTAN**  
**ADRESS : Karlbergsv. 32 B nb**  
113 27 Stockholm  
**TELEFON : 08 / 32 82 51**  
**PG : 458980 - 0**

# PROBLEMÊN KURDNASIYÊ

## YÊN PAŞWEXTIYÊ

*Destpêka vê nivisarê, dî hejmara  
Roja Nû ya 8'an da hatîbû weşandin.*



Şirovekîrin ravekîrinâ wan (Bnhr.RN8) gişkan ne wek hevin, dî nav wanda disêrtasiyên rind û gihiştî hene, nivisandına meteorialên tarixi, êtnografi, edebiyeti û yên ziman û zaravêñ kurdî bî tomeri û temami ne xirabin, lê lî nav wan da wusan ji nivisarêñ çep û rast û disêrtasiyên şaş û qelet hene, dî hine nivisar û disêrtasiyan da çend pîrs û problemêñ tarixa peydabûna neteweyê kurd û zimanê kurdî û wusan ji pîrsêñ sazmani û tertiba jiyin û ayina miletê kurd bî ne berkari û ne isbatî hatine nivisan-dînê. Lî nav wan da bî şaşî û xelet têne ber çavan nivisarêñ O.L Vilcevski, G.B.Akopov û yên çend merivêñ dîn, xasma yên tarixnas û etnografnas, yên lî ser tarix û kultûra kurdan nivisine. Derheqa nivisarêñ wan şaş da mîn dî wextê xwe da rexnegiri bî zimanê rûsi û kurdî çend nivîstokêñ ditna xwe lî kovarêñ kurdî û rûsi da çapkırine. Mesele şagirtê mîni emekdar Abdurahman Maruf ew nivîstokêñ mîn wergerandîne sorani û berhevoka akademiya kurdî da ya Iraqê da çapkırine, ewi ew hemû nivisarêñ mîn dî berehevokeke cihê da ,a bî navê "Prof.Qanatê Kurdo (Kurdoêv) Hendêk bir û bawara hete le barey ziman û me-

jûy Kurdewe wergeran û pêşeki D. Abdurahman Maruf, Bexdad, 1977".

Lî vira dîvêt bêjim pîrsa ferz û giring niha ne ewe binivisin dî kijan nivisar û disêrtasiyê da şaşî hene, dî kijan disêrtasiye da gili û xeberêñ ne rast û ne rasteqin nivisine. Pîrsa giring û muhim ew pîrse, ku dî vi zemani da her lî Sovetistanê da pîrsa û problemêñ vekolin û legerina tarix û kultûra mîletê kurd bî firewani û kûr hatine daninê, hatine nivisandînê, ku her lî Sovêtistanê da navendêñ kurd-nasiyêñ hatine sazمان kîrinê, ku bî arikariya wan navandan, bî arikariya xebatkarêñ wan lî nav çîl û pênc salan da (ji sala 1941 - 1985 - da) heta heftêpênc disertasiyêñ zanyari yên kandidatiyê û doktoriyê hatine nivisandin û pawankîrinê. Lê eger em baştîrin bala xwe bîdîne ser wan, emê bîbinin, ku hela hê gelek problemêñ kurd-nasiyê yên ferz û nirx ne hatine nivisandin û ravekîrinê. Ew problem evê jîrinin pêviste em wan dî danepêşen xwe paşwextiyê da binivisin û lî nav van salêñ pêşî da bîqedinîn.

Berê pêşin zanyarêñ me gerek mijûli vekolin û legerina tarix û kultûra neteweyê kurd bîbin, dest pê bîkin ji sedsaliyêñ pêşin, navin he-ta sedsaliyêñ nozdan. Legerina herdu

problemên mezin dîvêt dî van pirsê jêrin da bêne şirovekirin, ravekirin û zelal û safi kîrinê:

- 1 - Tarixa peydabûna miletê kurd.
- 2 - Tarixa fêodalizmê (derebegiyê) li Kurdistanê da (sedsaliyên pêşin û navin)
- 3 - Tarixa kultûra neteweyê kurd li nav sedsaliyên navinda.
- 4 - Tarixa şerê azadbûna kurdan li nav sedsaliyên 18 - 19.
- 5 - Tarixa peydabûn û pêşveçûna zimanê kurdi (Tarixa vekolina reng û rûyên (formên) zimanê kûrdi û zaravên kurdi).
- 6 - Légerin û vekolina zaravên kurdi: gorani, kermanşahi, lûr-feyli.
- 7 - Légerin û vekolina edebyeta kurdi klasiki.
- 8 - Légerin û vekolina yekiti û cüdatiya zaravên kurdi (kurmanci û sorani).
- 9 - Légerin û vekolina folklorâ kurdi dîvêt dî vê rîda bê kîrinê: 1) Vekolina şax û variantên dastanên kurdi yên dildariyê û qeremeniyê, II) Légerin û vekolina kilamên kurdi yên dildariye û mîraniyê, III) Légerina çirok û hêkyatên kurdi.

Heta niha bî pirani folkloristên me her bî tênenê bî pirsên komkîrin û çapkirina folklorâ (zargonâ) kurdi va mijûl bûne. Ew bî zanyari bî pirsên légerin û vekolina folklorêva mijûl ne bûne, xwerûya jiycin, ayin û bir û bawara kurdan dî wan da nişan ne kîrine, ne anine ber çavên xwendekar û xwendewerên xwe.

10- Wusan ji pêviste mijûli vekolin û légerîna tarixa peydabûn û pêşveçûna kovar û rojnamayên kurdi bibin.

11- Pêviste rola kovar û rojnama yên kurd nişan bikin, rola wan dî pirsên pêşvebirina kultûr, zimanê kurdi û bir û bawara azadbûn û ser-

xwebûna kurdi nişan bikin. Ev pirs gelek ferzin, zanyar dîkarin mijûli van pîrsan bin, destpê bikin ji vekolina rojnama "Kurdistan" (1889) he ta salêن sedsaliyê XX an. Usa ji pêviste ferhengênerin binivisin: I- Ferhenga zimanê kurdi kîlasikt, II- Ferhenga kurdi ya zaravên kurmanci û sorani, III- Ferhenga kurdi-rûsi ya here mezin, IV- Ferhenga rûsi-kurdi ya zaravên kurmanci û sorani.

Her komeke kurdnas û her merkezeke kurdnasen Sovetistanê bî xwe, bî xweseri xwe dîkarin bî problemeke jorin nîvisandiva mijûl bin. Mesele koma zimanzanen Leningradê sala par danepêş daye pêşîya xwe, ku li nav sê salan da ferhenga Rusi-Kurdi ya kurmanci û sorani binivisin.

Em hividarin ku komên kurdnasen dîn ji mina me planen légerinê problemen kurdi yên jorin nîvisandi bîdne ser xwe, li nav van salan da bîqedinin, yan ji pîrsê dayinîn, ku bî tevayı mijûli pîrs û problêmén here mezin û here ferz bin. Nav û nişanen disertasiyê kurdnasiyê, yên li nav cil sali da hatine nîvisandin û pawankirinê, nişan dîkin, ku li Sovetistanê da kurdnasi li dînyayê da ciyê here pêşin dire, ku kurdnasiya Sovetistanê büye dereceke Rohilatnasiya Akademiya Sovêtistanê, ku bî kisê hukmetê gelek ulmdar û zanyar mijûli légerin û vekolina tarix, ziman, edebyet, folklor û etnografiya miletê kurd dibin. Ew isbat dîkin, ku miletê kurd ji mina miletê dîn, mina cinarên xwe miletaki serbixweye, gelek tiştên hêja, bî nîrx û qimet xu liqandine û mafê miletê kurd ji heye bî azadi û sarxwebûn biji, bîbe heval û hevkare neteveyen pêşverû.

B E L G E Y E K

## KOMELA KURD BO BELAVKIRINA ZANİNÊ

( KÜRT NEŞR-İ MAARİF CEMİYETİ )

Komela Kurd bo Belavkirina Zaninê (Kürt Neşr-i Maarif Cemiyeti) piştî Meşrûtiyeta Duwemin dî sala 1910 da lî Stembolê sazbûye. Armanca wê, weki lî jêr hatiye nivisandan, avakırına dibistanêñ Kurdi ye û pêşvebirûna xwendin, zanin û hunermendi ye dî nav Kurdan da.

Destûra komelê bî Tîrki û tipêñ erebi hatiye nivisandin. Navê sazkeren wê ne xuyayı ne. Komelê çiqas kar kiriye, mekteb vekirine an na em pê nîzanin. Weki malûmatêñ gihiştine roja iro, piştî Meşrûtiyeta Duwemin li Stembolê dibistanêñ Kurdi vebûne. Dîvê ku ew bî destê komela hanê hâtibin sazkirin.

Destûr bî 34 bendan pêk tê. Me qasi 10 bendêñ wê yêñ gîring ji Tîrki wergerande Kurdi û lî jêr neşir dikin. Her usa ji, em, temamiya wê bî Tîrki û bî tipêñ erebi neşir dikin bo ku ji windabûnê xîlas be û kesên dînê bîkarîbin bo lêkolin û lêgerin jê istifade bikin.

Capxana Amedi  
Li Dora Dityumi Umumiye  
Li Küçük Sultan Mektebi  
Numre. 23  
1326 (Romi) 1910 (Isawi)

Bend - 1) Li Stembolê bî navê Komela Kurd bo Belavkirina Zaninê, komeleyeyeke merkezi û serbixwe hatiye sazkirin ku tenê bî karêñ firehkîrin û pêşvebirûna edeb, zanyari û hunermendi mijûl dibe.

Bend - 2) Armanca komelê û xebata wê ya bimbarek ev e ku xwendin, zanin û hunermendi fireh bike dî nav Kurdan da ku zêdetir bêpar in ji nêmetêñ zanyari dî nav ewladêñ welat da.

Bend - 3) Komela niha (dî destpêkê da) bî çêkîrin û amadekirina dibistanan li Stembolê wê mijûl bîbe. Kingê rewşa wê ya abori mecal da bî alikariya insani ya mirovêñ xwedi himmet û qiret, hingê bo bajar û gundêñ ku piraniya xelkê wan Kurd e û bî taybeti bo eşer û êlêñ ku rewşeke mazlûm dane, bo wan dest bî çêkîrin û zêdekîrina dibistanan bike û bona rakirina nezaniyê ji nav wan wê xebat bike.

Bend - 11) Sazker û endamêñ müşawere ku ji 33 kesan pêk têñ, bî rayêñ nehini û

piraniyê, ji nav xwe serokek û du hew serokê duwemin wê bibijêrin û tayin bikin.

Bend - 13) Merkeza komelê a giştî niha li Stembolê ye; li wilayet, lîva û qezayan qulubek û li nahiye û gündan şûbeyek wê bê avakîrin.

Bend - 23) Mesrefêñ dibistanêñ ku wê bîn avakîrin ji sazkeran, ji Kurdan û ji alikariya zaninperweran wê bê teminkîrin.

Bend - 24) Dibistanêñ avakri wê dî bin nezarata pênc kesên xwedi selahiyata taybeti bin û alikariya xelkê bî meqbûz û gora usûl wê bê girtin.

Bend - 27) Cins û mezhep ferq nake, hemû kesên ku dixwazîn xwedi zanin bin dîkarîn bîbin suxteyê van dibistanan.

Bend - 28) Bona ihtiyacê giranê Kurdistânê her sal du suxteyan ra imkana xwendîna zîrai bê teminkîrin û mesrefêñ wan bî terefê komelê wê bê dayin.

Bend - 32) Komele tabiyê Destûra Giştî ya Zaninê (Maarif-i Umumiye Nizamnamesi) ye û weki din dî bin nûfûs û tesira kessi da nine. Programêñ dersêñ ku dî dibistanan da wê bîn xwendin, bî aliyê sazkerêñ giştî têñ tayinkîrin.

## ﴿ کرد نشر معارف جمعیتی نظامنامه‌سی ﴾

ماده ۱ کرد نشر معارف جمعیتی نامیله منحصرآ علمی  
وادی و سناعی استانبولده مستقبل بر جمعیت مرکزیه آشـ کل  
ایتشدر .

## ﴿ جمعیتک مقصدمی اهـ ﴾

ماده ۲ جمعیتک مقصدمی و آمال مقدسه‌سی اولاد وطن  
ایخنده آش زیاده نعمت معارفدن محروم اولان کردار ارسانده  
معارف و صنایع نشر و تعمیم ایتمکدر .

ماده ۳ جمعیت شمدىلک استانبوله کرد چو جنگلرینه  
محخصوص مکتب ابتدائی تأسیس و احیاـیله مشغول اوله حق  
واحوال مالیه‌سی ارباب حیث وغیرتک معاونت انسانیه کارانه سیله  
مساعد بر حمله کالدکه اکثریت سکنه‌سی کرد اولان قصبه  
وقریب‌تره و بـ ترجیح مضموم بر حمله فلان عشـ اور و قبـ ایـ  
اردـ نـه مکتبـلـ تـ اـیـسـ وـ تـ کـیـلـهـ اـ زـ الـ جـهـ الـ لـ رـینـهـ  
جالـیـلـیـهـ جـنـدـرـ .

## ﴿ جمعیت مؤسسلری اهـ ﴾

ماده ۴ جمعیتـ مؤـسـ اـولـهـ بـیـلـعـکـ اـیـجـونـ بدـایـهـ لاـ اـقـلـ

( ۴ )

ماده ۱۰ بـلـادـهـ بـیـانـ اوـلـانـ مـقـدـارـدـنـ فـضـلـهـ اـخـحـابـ حـیـثـ  
طـرـقـدـنـ وـبـرـیـلـهـ جـلـکـ اـعـانـاتـ معـاـقـتـخـارـ قـبـولـ اوـلـنـورـ .

## ﴿ هـیـئـتـ اـدـارـهـ اـهـ ﴾

ماده ۱۱ مؤسـسـینـ وـاعـضـاءـ مـشاـورـهـ اوـتـوزـ اوـجـ ذاتـنـ  
منـشـکـلـ بـرـهـیـئـتـ اـکـنـزـیـ آـرـاهـ حـنـفـیـ اوـزـرـیـهـ اـیـجـولـنـدـنـ بـرـ رـئـیـسـ  
ایـلـهـ اـیـکـ رـئـیـسـ مـانـیـ تـعـیـنـ وـاتـخـابـ اـیدـهـ جـنـکـدرـ .

ماده ۱۲ جـمـیـتـهـ بـرـ رـئـیـسـ اوـلـ اـیـکـ رـئـیـسـ مـانـیـ وـتـدـورـ  
مـصـالـحـ وـامـورـ اـیـجـونـ بـرـ کـاتـبـ عمـومـیـ نـامـیـلـ خـذـمـتـ خـنـرـیـهـ اـنـهـ  
مقـابـلـ بـرـ مـعـاشـ شـہـرـیـ تـعـیـنـ وـتـخـصـیـصـ اـیدـیـهـ جـنـکـدرـ .

ماده ۱۳ جـمـیـتـکـ مرـکـزـ عـمـومـیـ شـمـدـیـلـکـ استـانـبـولـدـهـ  
اوـلـوبـلـایـتـلـدـهـ وـلـوـالـرـدـ وـقـضـالـرـدـدـ بـرـ قـلـوبـ وـنـاحـیـهـ وـقـرـیـلـدـدـهـ  
برـرـ شـعبـهـسـیـ بـوـلـهـ جـنـدـرـ .

ماده ۱۴ شـعبـهـلـرـ قـضـالـرـ اـیـلـهـ قـضـالـلـوـالـرـ اـیـلـهـ لـوـالـرـ وـلـاـیـتـلـرـ  
ایـلـهـ طـوـغـرـیـدـنـ طـوـغـرـیـیـهـ مـرـکـنـ عـمـومـیـهـ مـخـابـرـهـ اـیـتـکـهـ بـعـبـرـدـرـ .  
عـنـدـ اـلـ اـجـابـ شـعبـهـ وـ قـلـوبـلـرـ مـرـکـنـکـهـ طـوـغـرـیـدـنـ طـوـغـرـیـیـهـ مـخـابـرـهـ  
ایـدـهـ بـیـلـوـلـرـ .

ماده ۱۵ هـرـ شـعبـهـ وـ قـلـوبـ الـیـ آـیـدـهـ بـرـ وـارـدـاتـ وـ مـصـارـفـاتـیـ  
مـرـبـوـظـ اوـلـدـقـلـرـیـ مـحـالـهـ مـتـلـسـلاـ وـوـلـاـیـتـدـخـنـیـ مـرـکـنـکـهـ بـیـلـدـرـهـ جـنـکـ .  
وـفـضـالـهـ وـارـدـاتـ اوـلـورـ اـیـهـ مـرـکـنـکـهـ قـرـارـیـهـ کـوـزـهـ صـرـفـ وـیـنـماـ  
ایـدـیـلـهـ بـیـلـکـدرـ .



کرد نشر معارف جمعیتی  
نظامنامه‌سی



مطبـعـةـ آـمـدـیـ

دـیـونـ عـمـومـیـهـ جـوـارـنـدـهـ سـادـانـ مـکـتـبـیـ

زـرـقـانـدـهـ نـوـسـرـوـ ۲۳

۱۳۲۶

( ۳ )

ایـکـ لـیـرـاـ وـشـہـرـیـهـ بـرـ جـمـیـدـیـدـنـ دـونـ اـولـهـ مـقـ اـوزـرـهـ مـنـظـمـاـ  
وـبـرـمـکـ شـرـطـیـلـهـ بـلـاـ تـفـرـیـقـ جـنـسـ وـمـذـهـبـ هـرـمـنـورـ الـفـکـرـاـلـانـ  
مـؤـسـ اـولـهـ بـیـلـوـرـ .

مـادـهـ ۵ بـرـ کـیـمـسـهـ شـرـنـوـقـتـ اـیـسـتـ اـیـهـ مـؤـسـسـیـنـ مـیـانـهـ  
داـخـلـ اـولـهـ بـیـلـوـرـ . فـقـطـ کـمـشـ زـمـانـ عـائـدـ اـعـانـهـیـ دـفـعـةـ  
وـبـاـخـودـ تـقـسـیـطـاـ وـبـرـمـکـ مـجـبـوـرـ بـلـدـهـدـدـرـ .

## ﴿ جـمـیـتـهـ دـخـولـ شـرـائـطـیـ اـهـ ﴾

مـادـهـ ۶ مـکـبـ اـیـجـونـ بـدـایـهـ لـاـقـلـ بـرـ جـمـیـدـیـهـ اـعـانـهـ وـبـرـ وـبـ  
آـیـدـهـ اـوـنـ غـرـوـشـ اـعـانـدـهـ بـلـمـنـیـ درـعـهـدـهـ اـیدـرـکـ اـیـفـایـ تـعـهـدـ اـیدـنـ  
بـلـاـ تـفـرـیـقـ جـنـسـ وـمـذـهـبـ هـرـمـنـورـ الـفـکـرـاـلـانـ  
اعـضـاءـیـ مـشـاـورـهـ سـنـدـنـ اـولـهـ بـیـلـوـرـ .

مـادـهـ ۷ اـعـضـاءـیـ مـاـعـاـنـدـنـ اـولـقـ اـیـجـونـ دـخـولـیـهـ اـوـنـ غـرـوـشـ  
وـشـہـرـیـهـ بـشـ غـرـوـشـدـنـ دـونـ اـولـهـ مـقـ اـوزـرـهـ بـرـ مـبـلـعـ وـبـرـمـکـ  
اـیـجـابـ اـیدـرـ .

مـادـهـ ۸ اـعـفـاءـیـ طـبـیـعـهـدـنـ اـوـاقـ اـیـجـونـ اـبـتـدـایـ دـخـولـهـ  
بـشـ غـرـوـشـ وـشـہـرـیـهـ بـوـزـبـارـدـنـ دـونـ اـرـلـامـقـ اـوزـرـهـ بـرـ مـبـلـعـ  
وـبـرـمـکـ اـیـجـابـ اـیدـرـ .

مـادـهـ ۹ جـمـیـتـ اـفـرـادـنـدـنـ عـدـ اـیدـیـلـهـ بـیـلـکـ اـیـجـونـ اـبـتـدـایـ  
دـخـولـهـ لـاـقـلـ اوـجـ وـشـہـرـیـهـ بـرـ غـرـوـشـدـنـ دـونـ اـولـهـ مـقـ  
اـوزـرـهـ بـرـ مـبـلـعـ تـأـدـیـهـیـ لـازـمـدـرـ .

مشکل اولوب کاتب‌لره قاصه‌دار اشبو اعضادن و مراکز  
لواده‌ک مجلس اداره‌لری بر رئیس ایله‌ایکی رئیس ثانی واون اعضادن  
ubarat اولوب وزنده‌دار و کاتب‌لر بو اعضا می‌اندند و قضا قلوب‌لری  
مجلس اداره‌لرینک موجودی بش‌اعضا ایله بر رئیس ثانیدن  
وانحی‌لر ایله قریبه‌لرده‌کی اعضا و بر رئیس و کیلدن مرکب  
اوله‌جقدر .

### ﴿ مصارف تأسیسه مکاتب ﴾

ماده ۲۳ آجیله‌جق مکاتب مصارف تأسیسه و سائزی  
مؤسسلرک کردنک و دیکر معارفبرور وطنداش‌لرک اعنه‌لریله  
تامین اولنور .

### ﴿ صورت اداره مکتب ﴾

ماده ۲۴ مکتب مؤسسلردن صلاحیت مخصوصه‌ی حائز  
وابش ذاتک نظارتنی التنده بوله‌جق و ویریله‌جک اعنان اصولی  
دانه‌سنده بر مقبول متابلکه مؤیسنجه اتفاق ویا اکثریت  
ارا ایله شمده‌لک فخری اوله‌رق تعین قله‌جق صندوق امینی  
ظرفیت‌دن اخذ و قرض اوله‌جقدر . تساوی ارا ظهورنده  
رئیسک رأی رأی مضاعف عد اولنور . ریاست هر انعقاده  
قرعه ایله تعین اولنور .

قلندینی وجهله تمیین و مؤسسلر می‌اندنه ویا مؤسسلر طرفندن  
انتخاب اوله‌جق و منتظم دفاتر طوه‌جقدر .

ماده ۲۵ هیئت مؤسسه هفتده‌کون منتظم‌ما اجتماع  
ایدر و مقرر ایه اکثریت ارا ایله اتخاذ اولنور . اعضاي  
مؤسسه‌دن ملثانک وجودیله‌ده مقررات اتخاذ اوله‌بنور .

ماده ۲۶ جمعیت معارف عمومیه نظامنامه‌نه تابع اولوب  
بشقه هیچ بر نقوس و تائیر التنده دکلدر . مکتبده او قوته‌جق  
درسلرک پروغراملری هیئت مؤسسه‌نک تنبیله تعین  
اولنور .

ماده ۲۷ مکتبده او قوته‌جق درسلرک پروغراملری  
و جمعیت معاملات عمومیه‌نک هر سنه بر فذلکسی ترتیب  
وطبع اولنوب اعضاي مشاوره‌نک کافه‌نه ویا اعضادن طلب  
ایدنه‌که بر رنسخه کوندیلور . بو خصوصه مصلحه‌لری نظر  
دقه اولنور .

ماده ۲۸ اعضاي مؤسسه‌نک اتفاق ویا اکثریت ارا ایله  
اشبو نظامنامه‌نک توسع و تعديلی جائزد .

ماده ۱۶ اعضاي مؤسسه و مشاوره و معاونه و طبیعیده  
هرهانکیسی بلاعذر شرعی اوچ آیلق اعنه تراکمده قالورایسته  
جمیت کندو-نه مستعنی نظریله باقه‌جقدر .

ماده ۱۷ قلوب‌لرده خریدنون منهیات و قفار و عشرت قطعیاً  
منوعدر .

ماده ۱۸ اعضاي مؤسسه و مشاوره و طبیعیدن اولدولری  
مکتبده بر خدمت موظنه‌ایله مکاف بولانلر اصحاب رأیدن اولنوب  
بالکز مأموریتلرینه داير اینحاتات کندولرندن طلب ایدله بیلور .

ماده ۱۹ مکتبه و جمعیت مستخدمه‌نک دخی داخل اوله‌لری  
شرطدر . جمعیت‌هه داخل اوندقلری تقدیره ده معاشاتک یوزده‌اوچی  
نسبتده بر مبلغی صندوغه ترک ایمکه محبوردرل .

ماده ۲۰ کوی و قصبه‌لرده مصارف زائده‌دن توقي مقصدیله  
رئیس اعضاي‌دن برینک خانه‌نده ویا مناسب واهون بر محلده  
اجماع ایتک مجاز ایسه‌ده سنیجاق و مركز لرنده بهمه حال بر قلوب  
استیجاری ضروری او لمدیغ‌نده قلوبک بدل اینجـ ازه‌سی مصارف  
ضروریه و خدمه آینه‌ی ویریله‌جکدر .

ماده ۲۱ صناعی و تجاري هر در لو فابریقه و تجارت‌خانه‌لر  
زمان و سمعت مایه‌ده تأسیس ایملک جمعیتک محبوردر .

ماده ۲۲ مراکز ولايتد تأسیس ایدله‌جک قلوب‌لرک  
مجلس اداره‌لری بر رئیس ایله ایکی رئیس تأسیدن ویکری اعضادن

ماده ۲۵ مکتب صندوغنده الی لیرادن فضله بولنه‌جق  
و زیاده اولدیجه باقیه تودیع ایدله‌جکدر .

ماده ۲۶ مکتبه قبول اولنه‌جق طبله‌نک حسن حال  
احساح‌نده اولسی شرطدر . . . . .

ماده ۲۷ بلا تفریق جنس و مذهب هر طالب علم مکتبه  
قبول اولنور .


ماده ۲۸ کردستانک احتیاج فوق‌الماده‌نه بناء هر سنه  
ایک طبله‌نک زراعت تحصیله سوق ایدلسی و بونک اینجون  
لازم‌مکلان مصارفک جمعیت صندوغدن تسویه ایدلسی .

### ﴿ مکتب مدیری ایه ﴾

ماده ۲۹ اعضاي مؤسسه طرفندن انتخاب و تامین اوله‌جق  
مکتبک مدیری مکتبه نظارته مکاف اولوب لدی الایحاب تبدل  
ایده‌جک اولان بش اعضاي مؤسسه‌نک عمومی طرفندن اتفاق  
آرا ویا اکثریتکه ایک سنه ایجون انتخاب اولنور . و بو بش  
کشی اعضاي مؤسسه‌نک عمومی طرفندن انتخاب ایدلور .

### ﴿ صندوق امینی ایه ﴾

ماده ۳۰ صندوق امینی بکری اوچنجی مددده بیان



---

## CIVİN JI BO SERHILDANA 1925



Jı bo biranina 60 saliya Serhildana. Şêx Seid isal çawa li Swêdê wusan ji Elmanya Federal û gelek welatên mayin çend civin hatin pêkanin. Dî van civinan da sedemên serhildanê, rewşa politik li wê demê û wek van pirsan gelek pirsên mayin ji hatin şirovekirin, gelek guhdar li ser serhildanê bi tehreki rast agahdar bûn.

Çawa tê zanin dî sala 1925'an da, gelê Kurd li Kurdistanê li diji zordestiya netewi, kedxweri û li diji şovenizma Tirk bi pêşengiya Şêx Seid seri hilda û li diji zordestan, kolonyalistan dest bî şer kîr. Lê mixabin jî ber gelek sedemên der û hundur serhildan hate şikandin. Paşi vê binketinê hêzên nijadperest û şovên li ser gundi, cotkar, karker û belengazên Kurd lêdan, teda û zordestiyêñ bêhempa pêkanin. Serhildana Şêx Seid iro wek bûyereke mezin dî diroka Kurdistanê da tê hesibandin.

Jı bo biranina Serhildana Şêx Seid cara pêşin ji aliyê KOMKAR-Swêd da civineke mezin hate pêkanin. Dî civinê da nêziki 250 kesi besdar bûn. Ev civin dî roja 13-7-1985'an li bajarê Stockholmê hate

çêkîrin. Bî rasti dî nav van salêن dawin da eva cara yekemin bû weki civineke wusan fireh li ser serhildana Şêx Seid dihate çêkîrin. Jı bo zelalbûna hin pirsên serhildanê civin gelek kêrhati derbaz bû. Dî civinê da gelek gotarvanan cih girtin, wek Sekreterê Giştî Partiya Sosyalista Kurdistanâ Turkiyê Kemal Burkay, bî navê PPKK M.Ciwan, Omer Şexmus ji Polit Büroya Yekitiya Niştimanê Kurdistan, Şeref Yıldız bî navê Komita Piştgirtiya Partiya Koministên Turk, bî navê PDPKS Azad Hasan û niviskar Reşo Zilan. Jî van gotarvanan her yeki jî bo biranina serhildanê bir û baweriyêñ xwe gotin û li ser giringiya serhildanê sekînin.

Lî Elmanya Federal ji gelek civin bî munasebetê 60 saliya Serhildana Şêx Seid hatin amadekirin. Jî vana ya here mezin li Berlina Rojava hate çêkîrin.

Disa li bajarê Bremen, Stuttgart û hin ciyêñ mayin ji civinêñ biraninê hatin pêkanin. Dî van hemû civinan da li ser giringiya serhildana Şêx Seid hat sekînandin.

# KONGRA PSKT YA DUWEMİN PÊKHAT

PSKT dî meha Tebaxê da kongra xwe ya duwemin çêkir. Dî nav mercen dijwar da pêkanina kongrekê hêsa ne bû. Lê disa ji PSKT ev kar bî serfîrâzî pêkani. Dî nav mercen iro da kombûna kongra PSKT lî hemberi dijmin bû berxwedaneke mezin. Jî ber ku 5 sale cuntaya faşist jî bo pelixandina rêxistinê pêşverû û welatparêz çi jî destê wê hat ani cih. Kongre nişan dide ku ev kar û xebatêñ cuntayê nikare tekoşina gelê me bide sekînadin.

Kongra Duwemin bî bineke fireh û dî nav hewake demokratik da derbaz bû. Paşê rapora Komita Navbendi hate xwendin, li ser raporê raberzin çêbû, nûneran li ser problemîn politik rexne, bir-baweri û pêşneyarên xwe diyar kîrin. Hevalêñ nûner nav hefteki da li ser xalêñ rojeva kongra karêñ xwe ajotin. Nûneran kîmasi û xelatiyêñ ku ditibûn bî vekiri rexne kîrin. Bî dengen temami û nûneran politika partiyê ya bingehin hate parastin. Kongra Duwemin, li ser rewşa Kurdistanê û cihanê hur-hur sekini, wezifeyêñ gîring da ber xwe û bîryarêñ dirokê girtin. Dî dawiyê da komita navbendi a nûh bî dengê hemû nûneran hate hilbijartin, jî bo gelêñ Tîrkiyê û Kurdistanê bangek derxist .

Dî jiyanâ partiyêñ şoreşger da kongrek ciheki bî taybeti digre. Xeleti, şasi û kemasitên berçavkîrin û parti xuneke nûh digre.

Tu şik tune ku kongra PSKT ya Duwemin dî diroka partiyê û dî nav tevgera rizgariya netewa Kurd da wê ciheki gîring bistine.

Kongra duwemin bila partiyê û jî gel ra piroz bibe!

## BENDA MIN BE

Benda min be

Benda min be, ezê ji vegerim

Lê, geleki benda min be

Bisekine, dema zêde dibin keserêñ te

Dî bin baranêñ zer da

Dema berf jî ortê radibe

Benda min be

Dî rojêñ havinê yêñ germ û keleqiji da

Bî hêvi be

Dema ewana ne benda kesibin

bir dikin rojêñ bori.

Bendewarê diyarêñ dûr be

Eger neynêñ jî namê tu dengek

Bendewar be

Dema tu diwesti jî bendewariyê

Dîweste herkes.

Benda min be, ezê ji vegerim.

Nexwaze xweşiya wan kesan

Ewêñ ku dema hatîna birkirinê

ezbere dizanîn.

Bila diya min û kurê min mest bibin

Û biwestin

Bila hesab bikin em tune ne

Dostêñ min bila biwestin,

Bila dor-berê êgir bigrin

Û şerava tal vexwin

Jî bo biranina min

Bisekine... tu bî wan ra

Êriş neke tasa şeravê .

Benda bin be, ezê ji vegerim

Rîk-hêrsa min, jî hemû mîrinan ra

Bila bê bihistin gotinê wan

Ewêñ ku ne li hêviya minin

Û dibêjin "Êdi dawi hat"

Ewana ci dizanîn

Bendewari û hebûna te

Ya dî nav êgir da,

Çawa ez rizgar kîrim.

Emê bizanîn - dema ku ezê bijim

Tenê tu û emê bizanbin

Tenê tu hêviya min mayi

Xênci te kesek nema li hêviya min.

Wergervan: H.Şarwêran

Niviskar: Konstantin Simonov

# KURDISTAN:

## WARĒ CIWARBŪNA MIROVTIYE YE HERİ KEVN




MEDENİYETA HERİ KEVN : LI GUNDĒ GİSTO

M. ARARAT

Tu kesi heta niha bawer nedikir, ku mirovēn ji dema kevir ji bikaribûna diwara bijenin û xaniya ava kin. Jî deh salan vîrda komek ji pîsporê navnetewi; rohilatnas û arkeologên ji xwendegeha bîlind û Şikagoyê (Amerika), dirokvanêni diroka kevnare ji xwendegeha bîlind a Karlsruhe (Almanya) û yên ji xwendegeha Stenbolê, lî Kurdistanâ Tîrkiyê dî projeke "Vekolina Çandêñ Kevnare" da mijûl dîbin. Axa vê vekolinê lî gundê Çayênu ye, ya ku lî ser deşta Ergani û nêziki çemê Dicle ûbajarê Diyarbekir (Amûd) e.

Dî vê vekolonê da, ya ku hê dîdome, isal wareki angori 2800 m<sup>2</sup> yi derkete rûbarê erdê. Bî baweriya pîsporan, mazînaha vi wari wê dî dawiyê da bîghêje nêzika 30 000 m<sup>2</sup> yi û kevnariya wi ji dî nabeyna 7250 û 7500 beri bûyina Isa pêxember, ango beramberi 9000 salan ji sedsala me, tê texmin kîrin.

Lî ser wê axê diwarêni çaviyêni mala û hewşan hê xuya nîn. Bî goreyi salixdana pîsporan erdê (zemin) mal û hewşan ji kîlsê hatîye danin û lî ser rûbarê wê ji bî çimentoya mozayıqi va sıwax kırine. Ditîna vi wari lî Kurdistanê, ya ku warê ciwarbûna mirovtayê heri kevn lî dînyayê tê hesêbandîn, bir û baweriyêni pîsporêni diroka kevnare û arkologan tev lî hev kîr, ji ber ku wan heta niha texmin dikir, weki mirovêni wê demê hê dî şikeftan da jiyane û bona avakırına xaniyan daneketine deşte. Rex vê pîrsê, gelik pîrsêni dîn ji pîsporan metelmayi dikin, weke; gelo wan çewa kîls sunçrandiye û peyra ji hisk kiriye û bî wê erdeka qewim û paqîj pêk anine?



Dî çiviyên malan da, gelek aletên ji hestû û ji strû bikarani, şelbikên ji kevirê mermerê û moriyên cure-cure yê rengin hatin peyda kîrin. Aliyê din da, pîspor û zane lî ser jiyana mîrovêñ wê demê ya cîvaki ji serê xwe dîêşinîn. Aw, bî goreyi belgeyan eşkere dîkin, weki mîrovêñ wê demê cara pêşin avitîn û çînina zeviyan bî kar anîne û paşê ji dest bî xweyikirîna pez û dewar kîrine. Her wusa, qalîkên midyan, yên neqîşandi, çûyin-hatîna wan e Behra Sîpi (Mediterranean), ya ku beramberi 380 km yi ji wir dûr e, dîdine xuyanê.

Jenina diwaran bî hostatike pîr paqîş hatiye pêkaninê. Hin cihan da ji kîvş dîbe ku, gelek diwar piştî xîrab bûna wan ji nû va hatîne jenînê. Bî saya vê yekê ji, Arkeolog û dirokvan hêvi dîkin ku dî nav wi wari da rasti dewsêñ kevintir bêñ...

Bî vi tehri, bala dînyayê vege riya lî ser vê vekolina lî Kurdistanê. Rojname û kovaran dûr û dîrêj lî ser vê vekolinê nîvisandîn. Îlamki rojnameyên Tîrkiyê; wan ji rûpelêñ xwe yên pêşin bî wêne û beyanetên serokdewlet û weziran va xemilîndîn û pê kîfxwêş dîbin, ku pardarê vê mirata dewlemend ew in. Lê Kurdistanâ me û gelê me ji iro ji bindesti û belengaziyê perdar e. Lî ser axa xwe, welatê bav û kalê xwe em bindest in, dijminê gelê me ji çanda welatê me ya dewlemend ji xwe re dîhesibine û pê pesnê xwe dîde. Gotîneke pêşıya dîbê: "Hesp dîbeze, siwar pesnê xwe dîde". Lê heta kingê?

# Pirtûkxana Kurdi Lı Sovyetistanê Her Dewlemeñdtır Dibe

KURDOX

Beri çend rojan hozanê kurdnas J.S.MUSELİYAN pirtûkek nûh "STRANÊN KURDÎ YÊN GELÊRÎ" (Kurdîskiyê Narodniyê Pêsnî) da weşandin. Pirtûk lı Moskovayê, sala 1985'an da çap bûye Prof. Kurdnasê gewre Qenatê Kurdo serrastkarê berpirsiyare. Ev berhema nerxbîha jî 130 rûpelan pêkhatiye û 1650 hejmar rûni ditine.

Pirtûk bî du beşan parvebûye: 1- Beşê yekê bî zimanê kurdi (zaravê kurmanci) bî tipêr erebi ye. 2- Beşê dudîyan wergera beşa yekane bî zimanê rusi ye.

Hozan J.S.Museliyan dî pêşgotina pirtûkê da dînivise, weki lı pirtûkxana hîkumi ya bî ser navê M.E Saltikove Şêdrin lı Leningradê şeş destnîvisarên stranên kurdi yêngelêri bî zaravê kurmanci jî aliyê kurdnasê navdar A.D. JABA da hatine civandîn.

A.D.Jaba lı Tûrkiyê balyozê rusiya bû, ewi maweyeki dîrêj lı Erzeromê qedand, A.D.Jaba yek jî hozanê pêşîne, hewasa wi lı ser çanda kurdi hebûye. Ev stranan bî alikariya kurdan jî aliyê A.D.Jaba dî salêñ şêsti, sedsalêñ nozdan da hatine berevkîrin.

Nîvîskarê pirtûka nûh stranên civandi jî aliyê A.D.Jaba da bî sê beşan parvekîriye: 1- Stranên Lîrîki. 2- Stranên Qehremantiyê. 3- Stranên Govendan.

1- Stranên Lîrîki lı ser rûdawêñ jinê, hezkirinê û civaka kurdan dî sedsalêñ nozdan da ne û her weha ji, stranên xeribiyê dî vê bei da hatine berevkîrin. Stranên xeribiyê lı ser belengazêñ, ku welatê xwe berdîdin û jî bo xebatê diciñ welateki bîyani û lı wir bira welatê xwe dîkîn û hêviya vegeراندina welêt dîkîn.

Em dîxwazîn hîn kerîyêñ bîçûk û kîn lı ser stranên Lîrîki jî xwendevanêñ kovara ROJA NÛ ra jî tipêr erebi wergerinîn tipêr latini.

Mala me nebû dewleti  
Dî ser çiya zarke  
Dî bin ra xupana xamîrpete  
Sed heyf jî bîskê jî çavbelek  
Malê xwe bîdîm / bo wê / serê xwe deynme ber celêdê. (Rupel 20)

Dilê min mina xana misafiran,  
Têra dibohiri kerwanê gîran  
Tîrsa min evdal xudê ew tîrse  
Ez herim welatên xeriban bîmrîm  
Lî ser min ne qorina bav û biran. (Rupel 20)

Ezê xaniki çêkim ji rihanê  
Deriki dêkimê ji platanê  
Ez û xelqê delaiê têli  
Tê da rûnin her sê mehê zivistanê. (Rupel 21)

Hez kirina dilan pir şêrine  
Ne firotine ne kirie  
Heta qiamatê bî kule bî birine. (Rupel 22)

Kuro tu dici min ji bir meke  
Sêvek bîdme te di cêba xweke  
Tu carcaran min dî bira xweke

Ez dicim tu dimini, ezê sebreki ji ku binim  
Pê dilê xwayi xerep pê bixapinim. (Rupel 26)

Dilo xeman mexe zirav nebi  
Kemer li pişta te sist nebi  
Heri welati xeriban hêsis nebi. (Rupel 44)  
Dilo dîbê ji Helebê vîrda Hema

Darê zitonan hisin bûne li ber çeman  
Siwaro tu serê xwe hilên kulfetê te li çolê ma. (Rupel 47)

2 - Stranê qehremaniyê: Piraniyê van stranan lî ser ceng û şerane  
dê û bav hêviya vegerandina xortan ji şer dikin (hêvi dikin ku xortêwan  
ji şer vegerin û nûçeyê serketinê bî xwera hûnîn).


Hin ji van stranê qehramaniyê mirov dikane jêra bêje cihderên bûyerên  
jina kurdane, têkoşin ji bo serxwebûnê, xebat lî dîji serdarên tîrk dî sedsa-  
lênen nuzdanda ne. Lî vir ji em hin nimûnan, ji tipêneriwerdigerinin tipêneri  
latini.

Moşê şewiti bî gavo heri dilo lo lo dilo lo lo  
Çiwan van şayistan rengê xwe gewirin  
Xudayê lawikê min xelas bikê bî xêr vegere (rûpel 156)

Dibê vê baran rengê rengê dilo lo lo  
Dibênen dî dest Mistefê da yek şûre yek tîvinge  
Dibênen Mistefa kûştin nîzanın gawire yan firenge (Rupel 57)

Baran bari erd lewiti  
Hespê lawikê min şimiti  
Çavê min bî pismamê min ket dîlê min şewiti (Rupel 64)

3 - Stranê Govendê: Hinek ji van stranan dî cejnêngeleri da têr strandin  
û armac ji eve ku, lî şahîyan mîvan kîfxwes bibin, jîn û mîr destêne hev  
dîgirin û govendê gîrê dîdin, yê ko serê govendê dikşine jêra dibêjin sergo-  
vendi, ew destmalekê bî destê rastê radike û lî du wi reqisvanen dîndilizin,  
bî reqsê ra herweha ji, musiqe û saz ji lêdikeve.



Pirtûka J.S.MUSELİYAN:  
"Stranê Kudi Yê Gelêri"

Stranên lêriki cihê pêşin û mezin dî govendê da distinir, lî ser sırûstê, evinê, xweşbûna keç û xortan, benginan tê strandin. Beşê dîduyan ji stranên govendê lî ser dewetane, ew ji cure cure ne. Dî stranekê da lî ser deweta Heso ye, dî vîrda zave berê avdasê dîke, û paşê bûkê timin mala wi. Disan dî strana ser deweta Heso da, bî qiz û lawê maleke din ra dixwazin dewte bikin. Û ev şêwayê zawaçê lî cem gelên rohilatanavin û piştakvazê ji hebû.

Ez kînikim ji te kıntır lê lê kînê kînê kînê  
Ez geriyam ji te pirtir lê lê kînê kînê kînê  
Min kînika xwe min rîndîka xwe di  
Ji te çêtir lo lo devê min bî gorê. (Rupel 71)

Ez din nebûm te din kîrim  
Dî çol û beyeran war kîrim  
Ji xewa şêrin mehrûm kîrim. (Rupel 73)

Ez ne dinim ne durestim  
Lî ser xaniki we dînivistim  
Ve malixerabê ez lî erdê xîstîm. (Rûpel 73)

Her weha dî destnîvisaran da birek ji destana "Derwêşê Evdi" û keriyejkî rîstêñ helbestvanêñ nenaskiri ji hatine berevkirin.

Her sê şêweyêñ stranêñ bî gelemeperi bî sê malki û çar malki hatine nivisin, bili hîn awertan ko hin caran dumalkine. Wîsa ji dî van destnîvisaran dî stranêñ diyalogi ji hene wek strana ser "Gewrê û Xelil Begê"

Hozan J.S.Musilyan lêkolînek baş lî ser stranan kîriye û zanisti û huneri li dawiya pêşgotina xwe da dînivise, mirov ji komkêñ stranêñ A.D.Jaba dîkanne bigine hîn encaman, hemû rîzêñ malkan hevdû dîgrin, navaroka rîzêñ paşin lî gor yêñ pêşin dertêñ.

Dî strananda rexberi heye, yanê dî stranekê da lî ser pîr tiştan, û pîrsan tê strandin, lî ser gund, lî ser sırûstê, lî ser qizikêñ xwaşik û rîndîk û kîncêñ wan, lî ser hêviya evindaran û çawa bavêñ xwe dışının xazginiyê keçan, lê keç çûne mîrêñ dinê kîrine, an ji çawa evindar ji hevdû bî dûrkete.

Ji destpêkêñ rîzikan da, mirov dîbêje qey pêwendiyê wan bî rîzekêñ piştra tûneye, lê lî dawiyê raman bingehin tê diyarkirin, pîr caran nigarkirina sırûstê û bûyeran bî hevdû va girêdayime. Rexberi him caran wîsa ji hatiye, ji aliyeke da xemla sırûstê dî stranan da tê ber çavan û ji aliyeke din da derd û kûlen mirov têñ stran.

Bî gelemeperi ev stranan bî nigarkirina huneri û wêjeyi dewlemende. Nîviskara pîrtûka nûh bî çavêñ diroki lî stranan temaşekiriye, dîbêje "pîr stran lî gor bûyeran çêbûne, ji ber wê stranan ji navçeya derketi ra bastir tê femkirin, pîr nav û cih hene xwendevanêñ pîrtûkê wê nasnekin, loma min hemû navêñ gundan, xortan û êlan ji lî davîya karê xwe bêlekiriye. Bî şêwaki giştî J.S.Musilyan pîrtûka xwe bî rîkûpêk raberi pîrtûkxana çanda kurdi kîrye, bî vi kari ji, kelepura kevneşopi ya Kurd û Kurdistan her dewlementir dîbe.

# FESTİVALA MUNİHÊ Û RÜRESİYA HUKUMETA TIRK

Ísal dî 6'ê meha Tebaxê da, lî Elmanya Federal, lî bajarê Munih'ê Festivala Govendên Gelêri ya Cihanê pêkhat. Jî 35 welatan 100 komên govendê, ku ji 3000 kesan pêkhatibûn, tevi festivalê bûn. Festivalê 5 rojan dom kîr. Bî navê Kurdistanê ji, koma govendê ya Komela Karkerê Kurdistanê li Nürnbergê dî festivalê da besdar bû.

Vê komelê bî nîvîski muracaati Komita Amadekariya Festivalê kîr, ku bî govendên gelêri yên welatê me tevi festivalê be. Pişti çend roja, ji komitê bersiveke erêni (pozitiv) girtin. Biryara besdarbûna vê komela endamê KOMKAR, hatibû standin û pey manek dî navbera wan da hatibû danin.

Dema festivalê destpêkir, komên govendê bî nav û ala welatê xwe derdiketin podyumê. Pêşandar (sunucu) lî ser wi welati mikrofonê da agahdari dîda. Dema dora govendê Kurdistanê hat, qasi 20 kesan bî ala kurdi û bî pankarta KURDISTAN'ê derketin podyumê. Wê gavê pêşandarê festivalê : " Belê niha bî tiradisiyona gelê kurd ya 3000 salan kevn, Koma Govendên Kurdi bî sazbendê xwe va lî hemberi we ye" got.

## ÇAVNEBARİYA HUKUMETA TIRK

Hin dî destpêka muracata festivalê da, sefareta Tirkiyê bîhistibû ku bî navê Kurdistanê komeke govendê muracaati festivalê kîriye. Lema xwestin bî awaki rê lî ber koma kurdan bigrin nehêlin ew tevi festivalê bin. Lê nikaribûn. Paşê wezareta Tirkiyê ya derva têkili vê pîrsê bû.

Bî destpêka festivalê ra, rojnameyê burjuva yên Tirkiyê, lî ser festivalê û besdarbûna Kurdan, lî ser hev nîvisandin. Radyo û Televizyona Tirkiyê, dî nav dema festivalê da wek xebera pêşiyê behsa festivalê dikirin.



Cûnta kolonyalist-faşist ku hebûna gelê me, çand, ziman û diroka gelê kurd inkar dîke, jî beşdarbûna komeke govendê bî navê Kurdistanê, aciz bû. Hevalbendê dewleta Tirkiyê a kolonyalist-faşist xwe zû gêhandin hewari ya wan. Hukumeta Kohl, lî ser Komita Fastivalê zordari kîr ku koma Kurdistanê jî ber sedemên siyasi jî festivalê hate derxisttin. Ev êrişeke tevayı bû lî ser çanda gelê kurd.

Pişti biryara ixrackırınê, koma Kurdistanê jî bo paşdakîşandina vê biryare muracaati dadgehê kîrin. Bang lî rojnamevanan kîrin û lî ser sedemê bingehin yê vê biryare ew agahdar kîrin. Pişti vê civinê belavokek belakîrin.

Lî gel hemû asteng û hilebaziyan, koma govendê Kurdistanê, roja girtina festivalê jî bo protestokırına vê neheqiyê, derketin podyumê. Juriya festivalê cihê xwe terk kîrin cûn. Lê paşê du endamên juryê paşa vegeriyan û gul avêtin podyumê. Bî vi awayi wan ji biryara ixrackırına kurdan protesto kîrin.

Dewleta Tirkiyê ya kolonyalis-faşist, jî govendên kurdi, jî zimanê me ji sitranêne me ji dîtirse. Lê idi iro lî dervayi welat ew nikarin wek berê hebûna gelê kurd, çand û diroka wi inkar bikin, lê xwedi derkevin. Lî dervayi welat, xebatêni siyasi û çandi yên rîxisttinêne Kurdistanê rûyê dijmîn ê reş derdixe meydanê. Lema dijmîn bî hêrs dikeve, gefan dixwe, êriş dîke. Lê bê çareye ew. Dî paşerojê da hewariya dostêne wan yên emperyalist wê nikaribe wan xîlas bîke.

# FESTİVALA CİWAN Ú XWENDEKARÊN

## CİHANÊ YA 12'A

### PÊKHAT



XII MOÇKA 1985

Sala 1985 a jî aliyê Koma Milletên Yekbûyi da wek sala ciwanan hate e-lankırın. Lî ser pêşniyara Rêxistina Ciwanen Komûnist yên Sovyetê (KOMSOMOL) û bî bîryara Komita Amadekariya Navnetewi "Festivala Ciwan û Xwendekarêن Cihanê ya 12 a", isal dî navbera 27' Tirmehê û 3'ê Tebaxê da lî Moskovayê pêkhat.

Dî bin şıara "Pıştgiriya Anti-Emperyalist, Dostî û Aşiti" da, jî Tirkîyê û jî Kurdistana Tirkîyê ji nuwênerên rêxistinêñ ciwanan (DHKD, GEB, Genç Öncü, İGD, SGB) dî festivalê da besdar bûn. Dî nav delegasyona Tirkîyê û Kurdistana Tirkîyê da, 15 hunermend û niviskarêñ Tirk û Kurd ji tevi festivalê bûn.

Festivala Ciwanan û Xwendekarêñ Cihanê ya 12 a, lî gor armanc û bernama xwe bî serfirazi derbasbû.

Jî 157 welatan, 20 hezar nuwênerên rêxistinêñ ciwanan û xwendekaran, lî Moskovayê civiyan. Wan, pişt-

giriyeke xurt dane ciwanen welatên Amerika Latini, ya navin, Asya, Afrika, Derya Sipi û Rohilata Navin, yên ku diji emperyalizmê, kolonyalizmê, kolonyalizma nû, faşizmê û njadpereziyê şer dîkin.

Programa festivalê pîr dewlemend bû. 250 daxuyaniyêni siyasi, çandi û sportif pêkhatin. Dî 15 merkezên politik da, 5 hezar nuwênerên ciwan, dî foruman da, dî civinêni maseyêni glover da, lî ser pîrsêni netewi û navnetewi yên civaki (sosyal) abori (ekonomik) û çandi (kulturel), raman û baweriyêni xwe pêşan dan. 50 mitingên piştgiriyê pêkhatin.

Dî nav dema festivalê da, Moskova dîkeliya. Gelê Moskovayê, bî daxwaz û gumana aşitiya cihanê, jî ciwanen cihanê ra hembêza xwe vekiribû.

Festival dî Stadyuma Lenin da, bî gotara Sekreterê Gîsti yê Komita Nawendi ya Partiya Kominist ya Yekitiya Sovyetan, Gorbaçov vebû. Gorbaçov dî gotara xwe da, lî ser pêwistiya yekbûna ciwanen cihanê jî bo aşitiyê, rawestiya.

# DHKD'ê

## Di Festivalê da Dengê Ciwan û Xwendekarên Kurdistanê Bilind Kir



Bî navê ciwanê Kurdistanâ Tîrkiyê, nuwênerên DHKD'ê dî festêvalê da bî xurti cihê xwe girtin. Wek hûnermend ji Hozan Şîvan, wênevan Siyabend û helbêstvan Gundi tevi festivalê bûn. Wan dî nav dema festîvalê da xebateke jêhati kîrin. Bî delegasyonên dîn ra pêwendi; dî civin û foruman da lî ser têkoşina gelê me a-xaftin; beşdarbûna miting û daxuyanîyên dîn, xebatêne sereke bûn jî bo delagasyona DHKD'ê. Nuwênerên DHKD'ê, bî flama xwe ya bî rengên kurdi yên netewi (kesk, sor û zer), û bî slogan "Pışgiriya Anti-Emperialist, Dosti û Aşiti", dî 16 miting û meşê giring da beşdar bûn. Bî gelek pêwendi, dan û standinan, rewşa Kurdistanê, zordestiya kolonyalist û

faşist lî ser gelê me, bî awaki fire hate teşhirkirin. Çanda geli kurd hate danasin. Dî vi wari da Hozan Şîvan PERWER roleke baş leyist. Dî bernameyên çandi da Şîvan musika kurdi pêşkêşkir. Televizyona Sovyet du caran, televisyona Çekoslovakayê careki bî Şîvan ra hevpey-





vin çekirin. Televizyona Polonyayê bî nuwenerên DHKD'yê ra hevpeyvin çekirin û wêneyên (resmên) Siyabend girtin filmê. Wêneyên Siyabend, lî "Merkeza Hunermendêن Ciwan" û li otela Kosmos hatin raxistin. Televizyona Yunanistanê bî hevaleki ra hevpeyvinek çekir. Radyo-ya Moskovayê beşê türki bî nuwênerên DHKD'yê ra hevpeyvin çekir.

Gelek Kurdên ku lî Sovyetê dîjin hatin serdana delegasyona Kurd. Roja dawiyê bî xwendekarêñ kurd ra

civinek hate çekirin. Lî ser xebatê festivalê û lî ser DHKD'ê bî wan ra hate qisekirin û dan û standinêñ ramani pêk hatin. Delegasyona Tîrkiyê û Kurdistana Tîrkiyê bî tevayı şeveke çandi amadekirin. Şivan Perwer, Melike Demirag û hunermendêñ din programeke dewlemend pêşkêşkirin. Gelek xwendekarêñ kurd ku lî Moskovayê dixûnîn, dî wê şevê da beşdar bûn.

# KURDÊN SOVYETÊ CI GOTIN?...




**Prof.I.O.FARIZOV**

Doktorê zanisti prof. Farizov, ji Kurdên Tîbilisê ye.

Ew li Universita Moskovayê, serokê kursiyê xwendinê Afro-Asyayê, beşa wendiyê ekonomik yê navnetewi ye.

*Prof. Farizov*

"Zehf tişteki mezin û hêja ye weki cahilêd (ciwan) Kurdistanê tevê festivalê bûn. Wan di nav cahilêd cihanê da, bona edlaya (aşitya) cihanê şuna xwe baş girtin. Iro idi baş diyar e weki cahilêd Kurd pîrsa gel û wêlatê xwe, di nav pîrsên cihanê da dibinin. Kes qasi cahilêd Kurd, qasi gelê Kurd qimet û bîhayêgiran nade aşityê û azadiyê. Ez geleki dîlxweş bûm wexta min bîhist ku cahilêd Kurd, bi navê DHKD delegatên xwe şandine festivala 12 a. Li hember zordestiyê û faşizmê, cahilêd Kurdistanê yê pêşverû geleki pêşda çûne û gereke hin ji pêşda herin û xurt bibin ku bikaribin li ber tengasi û dijwariyan serifraz bin."



**NASIM**

Nasim Nadirov, kurdeki Kazakistanê ye. Wi li Moskovayê di fakultêta filologiyê da ziman û edebiyata rûsi, zimanên kevn wek; farisiya kevn, hindiya kevn, zimanê Avesta û hititi xwendiyeye. Wi ji universita Moskova "diploma sor" wergirtiye.

Nasim niha disêrtasiya xwe li ser "Rûberhevkirina diroki ya fonetika zimanê kurdi" amade dike.

Di festivalê da Nasim, ji delegasyona Avusturiya ya netewi ra wergêri kîr.

*Nasim:*

"Bernama festivalê pur dewlemend e; miting, konferans, ciwinên piştgiriyê, daxuyani û şayiyên mezin... Lê xasma ji bo min tişte intresant ew e ku ez niha li festivalê nuwênerên ciwan û xwendekarên Kurdistanê ji dibinim. Ez gelek pê şa me. Ew pir zirekin, van çend rojê han min ji nêzik va bala xwe da ser wan û min dit'ku ew bi discipline-ke baş dixebeitin. Herwisa ez pur şabûm ku fersend çêbû min li vir hozanê Kurd Şwan Perwer ji dit. Dema ez vege rime malê, li Kazakhstanê ez dê behsa van rojêñ xwes bikim.



**AZA**

Aza, ji kurdên Tîbilisê ye. Malbata wan ji hêla Qersê (Kurdistana Turkiyê) di sala 1920 an da hatine Sovyetistanê. Azayê di xwendegha bîlind da beşê rojnamevaniyê qedandiye. Ew niha li Moskovayê diji û dixebite. Wê, di festivalê da ji nuwênerên Kurd ra bi awaki resmi wergêri (tercumanati) kîr.

*Aza:*

"Hatina Kurdan pur tişteki mezin e. Li vir, li Moskovayê, li dewlata Sovyetê gelekan ditin ku delegatên keç û xortêñ Kurdistanê ji di festivalê da, bi xurti cihê xwe girtin. Di vê festivala mezin da gelek kesan di saya wan da bi gelê Kurd û Kurdistanê agahdar bûn. Wê pur baş be weki keç û xortêñ Kurd di festivalan da, di ciwinên navnetewi da beşdar bin. Ev tişteki pur pêwist e û ronahiya kesk bi vê festivalê ji keç û xortêñ Kurd ra vebû. Ez hêvi dikim ku ev rê hertim li ber Kurdan ve kiri be. Ez geleki dîlxweş bûm weki DHKD bi navê keç û xortêñ Kurtistanê, di festivalê da bû dengeki xwes tevi dilana keç û xortêñ hemû welatan bû. Ew di festivalê da bû guleke ges û kete nav bûketa festivala 12 a."

## RİYA CEJNÊ NİNE, RİYA ŞOREŞÊ

Ev maratoneke, jî bir neke  
Rê jî berjêr û berjor  
Rast û çep şaxur û hezaz in

Jî tera hêvi û kelekel dîvê  
Dîvê xwedi ûsûl û erkan bi  
Gavêن xwe bî hisyari bavê

Hostati ne dayina xwedê ye  
Dîvê xwe bîwestini  
Bîhna te teng be, mala te şewiti  
Bazûyêن xwe xurt ke  
Beri ku derkevi meydanê

Bî dû hêrsa xwe mekev  
Jî hunguv şirintir e, lê kor e ew  
Ger bîhna te qetiya, lî rê mayi  
Ger zora te bir tîrsê  
Meke qir û vir  
Meriv dîkare bî camêri ji bîkeve  
Bî qelsi ji

Lî ba me camêri bî kar tê pivan  
Bî berxwedan lî qenterê dîkeve  
Dil dî berjoran da tê cêribandin

Dî vi kari da  
Windakîrin ji heye, mirin ji  
Riya cejnê nine, riya şoreşê  
Klama me nivçê bimine ji  
Wê bêjin, temam bikin kesen din

BARAN

## ME WELATPAREZEKİ KURD WINDA KIR

Welatparêzkeki kurd M. Remzi Bucak, roja 17'ê tirmehê 1985'an li Parisê çû ser heqîya xwe. Bucak, 25 salêñ dawiyê ji jiyana xwe li nafitîyê (li dervayî welat) derbas kîribû.

M.Remzi Bucak, dî sala 1912'an da li gundê Anzo-girêdayî qeza Siwerek-hatiye dinê. Hin dî salêñ xwendekariyê da, fikur û ramanêñ welatparêziyê li ba wi peydabûn. Wê dewrê, dî nav xwendekarêñ Kurdistanê da, bî rasti kesen wêlatparêz kêm bûn, bî tiliyan dihatin jimartin.

Wi dî sala 1934'an da, li Universita Stenbolê fakulta huquqê xelaskir. Wi, wê demê li Stenbolê bona xwendekarêñ Kurdistanê, bî navê Dicle-Fırat yurdeke (mala) xwendekaran ve-kir.

M.Remzi Bucak dî nav-

bera salêñ 1950 û 1954'an da, dî Demoqrat Partiyê da mehbûsê Diyarbekrê bû. Lê paşê ji DP'ê veqetiya. Wi baş dizanibû ku her kijan hukumeta dewleta kolonyalist bê ser hukum, zordesti û neheqîya li ser gelê kurd didominin. Dî sala 1959'an da hukumeta Menderes-Bayar, zordestiya xwe li ser gelê kurd zêdetir kirin. Pişti girtina gelek ronakbirêñ kurd -ew bûyer wek bûyera 49'an tê naskirin. Bucak mecbûr ma ji welat derket.

M.Remzi Bucak, dî nav 25 salêñ jiyana xwe ya nefitiyê da, li gor imkan û genziyên xwe, piştgiriya şerê rizgariya netewi ya Kurdistanê kir. Wi, dî sala 1964'an da, ji Koma Miletêñ Yekbûyi, "Komisyonâ Şerê Diji Nijadperestiyê û Kolonyalizmê" ra, li ser pîrs û dijwarêñ gelê kurd nameyek şand

û ji wan daxwaza piştgiriya pîrsa gelê kurd kir.

M.Remzi Bucak, hetani dawiya sala 1983'an li Amerikayê û heta mîrma xwe ji li Parisê jiya.

Dî navbera Redaksiyona Roja Nû û M.Remzi Bucak da gelek caran, bî şandina nameyêñ pêwendiyêñ nêzik çêbûn. Roja Nû, vi welatparezê dilsoz bîbir tîne û em dizanîn ku rojekê gelê me, wê dî nav azadiyê da li welatparêzên xwe xwedi derkeve û xebata wan bîbirbine.

Cenazê M.Remzi Bucak, roja 25.7.1985'an, pişti civinekê berbi welat hate şandîn. Li ser daxwaza wi ew li kêleka gora hevalê wi yê xebatê, welatparêzê kurd Faik Bucak hate binaxkirin.

Gelek rêxistin û kesen welatparêz, dî civina cenazê M.Remzi Bucak da besdarbûn û jê ra çeleng şandîn.

## YEK SALIYA BİRANINA

### YILMAZ GUNEY

Dî ser mîrma rejisor, filmçêkir û hunermendê Kurd Yılmaz Guney ra salek derbaz bû. Lê navê wi iro dî nav bî hezaran welatparêzên Kurd da tê biranin û navê wi diji. Yılmaz Guney çawa tê zanin dî salêñ xwe yên efrandar, jindar û ciwan da ji nav me bar kir, çû ser heqîya xwe, dema wi çavê xwe dan hev, ew tenê 47 sali bû. Wi gelek filmêñ hêja çekir, bî xwe têda list, an bû rejisorê wan an ji senaryoyê wan nîvisin, wek filmêñ "Rê", "Diwar", "Hêvi",

"Keri"... Yılmaz Guney ne tenê li Kurdistanê û Tirkîyê, ew wusan ji li nav hemû refîn filmhizîn cihanê da hatîbû naskirin. Mîrma Yılmaz Guney, ew mîrma bêwext, dî nav tekoşina me ya çandi, huneri da valahike mezîn vekir, bî hezaran welatparêzên Kurd xemgin bûn, rûsar bûn. Jî ber ku wi dî warê çêkirina filmêñ Kurdi û diroka sine-maya Kurdi da rêçeve nû vekiribû, gavine pêt, xurt û gavine bî fesal davêtin, bî kurti ew dî vê rê da bûbû neferek.

## Dirokzaniya Tîrkan

### Derheqa Kurdan û Pîrsa Kurdan Da

Dî hejmarêñ 54 û 55'an yên rojnama "Riya Teze" da, nivisareke dûr û dirêj bî destê dirokzan Meri Koçar hat weşandin. Ev nivisara cara pêşin dî rojnama "Gra-kan Tert" da derket paşê çapa wê ya Kurdi dî "Riya Teze" da hate weşandin, navê nivisarê "Dirokzaniya Tîrkan Derheqa Kurda û Pîrsa Kurdan".

Meri Koçar dî nivisara xwe da, bî çaveki zanisti li ser şâsi, xeleti û çewtiyêñ "Kurdologên Türk" dîsekine, çawa tê zanin dî van salêñ dawin da li Tîrkiyê li ser Kurdan, çand û zimanê

diroka kurdi gelek pirtük hâtin weşandin, bî taybeti ev pirtük, dî nav rêza pirtukêñ "Instutiya Légerina Çanda Türkî" (Türk Kültürü Araşturma Enstitüsü - Ankara) derketin. Wek "Bajarêñ Rohilatê û Diroka Vartoyê -M. Şerif Fırat, 1983, Ankara.

Vê Enstutiya Türk ev weşanêñ xwe yên li ser Kurdan ji Universita Erivanê ra şandine, weki Universite li ser van weşanan bir û baweriyêñ xwe diyar bike, dî davîya namayêñ xwe da ji nivisine "... Lî eger nama me bê bersiv bibine, ewê nişan bide, weki weşanêñ me bo-

na we hewaskar ninin û emê ji vir şunda tu tiştî we ra naşinin. Bî daxwazêñ here baş û hurmetê. Instutiya Légerina Çanda Türkî - Enqere".

Meri Koçar, dî vê nivisara xwe ya dî rojnama "Riya Teze" da çap bûye bersiva wan dide û van "zaneyêñ derewin" rûreş û sosret dike. Meri Koçar hebûna netewê Kurd, çand, ziman û diroka Kurdi bî çaveki zanisti analiz dike, zaneyêñ Türk çîqas xîzan û belengazin, dî warê zaninê da ew çîqas paşa mane, vê yekê ji dî nivisara xwe da baş diyar dike.

### Du Program li Ser Muzika Kurdi

Hevalêñ heja,

İro ji gelê Kurd nikare bî zimanê xwe stran û muzika xwe guhdari bike. Wexta bî zimanê xwe stranêñ xwe guhdari dike, ji aliyê cuntaya faşist da eşkence û zilmê dibine û mirovên me davêjine zindanê. Bo van tiştan bî sedan insan zindana cuntaya faşistane. Lî gelê Kurd, ber vê zilmê û zordestiyê hustiyê xwe tucar xwar nekriye û nake ji.

Dijminê xunxwar asimlasiyoneke tûj li ser ziman û kultura Kurdi ajot. Lî van tiştana ji wan ra pere nekir. Gelê Kurd, ziman û kultura xwe tucar ji bir nekir û bo van tiştana tekoşin da û niha ji tekoşin dom dike.

Du welatparezê Swêdi programeke muzika dî Radyo'ya Swêdi da çêkirin. Dî wê programêda 10 deqe wext cih dan bo Kur-

dan ji. Derheqa Kurdistanê da informasyon da û qala zilmê û eşkence kir û qala assimlasiyona ku li ser zimanê Kurdi kir. Pey vê informasyonê, muzika Kurdi û stranêñ Kurdi di radioyê da hatin weşandin.

Ev program 27. Tebaxê roja sêşemê seet 9.25'da, dî Programa 3'da hat weşandin. Navê programê "Aşiti û Azadi" bû. Ev programa pêşin ji aliyê Gun HOLMTRÊM da hat amadekirin. Ew dî "Sveriges Riksradio" bajarê Luleo kar dike û bî xwe ji rojnamevane.

Programa duwemin 30. Tebaxê roja Înê seet nabera 9 û 9.30'da disa dî programa 3.'da li ser Kurdistanê informasyon da û stran û muzika Kurdi hat weşandin. Kesê ku program amade kırıbû navê wi Bengt GRAHN bû.



## prof. FARİZOV:

" Pîrsa Aşitîyê pîrsa hebûn tunebûna mirovtiyê ye. Ew jî bo hemû gelan, herwisa jî bo gelê Kurd ji pêwist e."

Wek tê zanin, dî nav kurdên Sovyetê da gelek kesên alîm, niviskar û hûnermendêne hêja gihiştine. Gelekan jî wan, dî warê xebata xwe da xîzmetêne mezin dane ziman e-debiyat, dirok û çanda gelê kurd. Wek xwendevanêne me ji dizanîn, heta niha me cêrgek nav, ji van kesan, dî Roja Nû da, bî xwendevanêne xwe da naskîrin û li ser kar û xebatêne wana me xwendevanêne xwe agahdar kîrin. Wek : Heciyê Cîndi, Eliyê Evdîrehman, prof. Qanatê Kurdo, Çerkez Bakaev, Ordixanê Celil, Ereb Şemo û gelek na-vêne din yêne hêja...

Vê carê naskîrin û danasina zanyareki kurd, Prof. I.O. Farizov jî mera peyda bû. Me ew dî festivala Cîwan û Xwendekarêne Cihanê da li Moskovayê dit û pêra peyivin.

Piştî ku Farizov hatîna delegasyona Tîrkiyê û Kurdistanâ Tîrkiyê bihistibû, du caran hate otêla ku nuwênerên DHKD'ê lê diman. Roja dawiyê ji ew bî me ra heta meydana balafirê hat û em rîwikîrin. Miroveki rûken û zimanxwes e Farizov. Bi hatîna delegatêne ciwan û xwendekarêne Kurdistanâ Tîrkiyê şabibû.

— Ez bi hatîna we geleki dilxwes bûm. Ez geleki şame ku iro keç û xorten kurdan ji, jî bo azadiyê û aşitîyê dî vê festivalê da besdar dibin.

### FARİZOV Kİ YE?

Farizov di sala 1923' an da li Tîbilisê hatîyê dinê. Dê û bavê wi ji hêla Qersê hatîne Sovyetistanê. Bavê wi paleti û diya wi ji kevantiya malê kiriye.

Ew dibistana navin li Tîbilisê kuta dîke. Hema wê salê şerê cihanê duwemin destpê dîke û Farizov salêne xwe mezin nişan dîde û bî dîlsozi tevi şer dîbe.

— Min ev yek wek kurdeki li ser xwe wezife û pêwist dit. Ez li diji ordiyêne faşist ketme nav şer, şer da 4 caran birin-darbûm. Saleki dî nexweşxanê da mam.

Farizov piştî şer nişana mîrxasiyê dîre. Paşê ew diçe Enstituya Rohilata—Navin. Di enstituyê da wek mamosta dimine. Di sala 1953'an da disertasiyê xwe temam dîke û dîbe berendamê (kandidatê) zanistiya dirokê.

— Lî gel xebata min ya dirokzaniyê, min xwest ez zimanê kurdi ji eyan bikim. Lema cara pêşiyê min ferhengeke kurdi-rûsi amade kîr. Vê xebatê gelek pesnên genc girt. Weki din jî min li ser ziman û diroka Kurdi gelek bend (miqale) nivisin. Min kitêba Nikitin "Kurd" wergerand ser zimanê rûsi.

— Di nav xebata minya zanistîyê da, pîrsa kurdan wek meremeki jiyana min her tim cih girtiye.

Wi li ser reforma axê(erdê), jî bo welatêne rohilatê, çen pirtük nivisiye. Heta niha qasi 20 pirtükêne mezin wergerandiye.

Farizov, di sala 1970'an da dereca dok tora dirokzaniyê distine. Di sala 1975'an da dîbe profesorê Universita Moskovayê. Ew niha serkarê kursiyê xwendinê Afro-Asayı, beşa pêwendiyêne navnetewi ye. Ew herwisa serokê delegasyoneki ye û diçe welatêne dereke.

— Delegasyona me ji bo şirovekirin û diyarkirina siyaseta Sovyetê, li derbari aşitîya cihanê, li ser pîrsen navnetewi, yêne çandi, abori, diçe welatêne derva. Ez çend caran hatime Swêd ji.

Pîrsa aşitîyê pîrsa hebûn tunebûna mirovtiyê ye. Hebûna aşitîyê ji bo hemû herwisa ji bo gelê kurd ji pêwiste.

Bona ku aşitiya cihanê pêkbê gereke hemû gel azad û serbest bijin. Teminata aşitîyê azadi û demokrati ye, jî bo hemû welatan.

Dî nav axiftina xwe da, Farizov, gelek caran li ser giringaya yekitiya hêzên Kurdistanê yêne pêşverû û welatparêz rawestiya. Dema behsa pêşengiya tevgêra azadiya gelê kurd kîr, weha got:

— Partiya Sosyalist a Kurdistanâ Turkiyê hêvi û gumaneke xurt dide mirov. Ew partiya duwarojê ye.

(...)

— Kêfa min zehf bî Roja Nû ra tê. Ez wê, nişani hevalen xwe didim dibêjim binhêrin idi kurdên me ji tiştên weha hêja bî zimanê xwe derdixin. Eger hûn çend heban zede ji min ra bisinîn ezê geleki razi bim.

# KAMPANYEK

## BONA ZIMANÊ DAYIKÊ

İro li Elmanya Federal nêzkaya 300 000 kurd dîjin, li dewayı welat, Elmanya Federal welatê heri mezinire ku Kurd têda dimin. Lê li vi welati mafêngelê Kurd yên netewi û çandi bi çaveki resmi hê nehatine qebûl kirin. Hukmeta Elmanya Federal ji ber pêwendiyên xwe li gel Turkiyê, ji ber ku ev herdu welat ji endamên NATO'ye ne, naxwaze bî navê Kurdan navbera wan û Turkiyê hev bîkeve, ne baş be. Bo vê ji iro li elmanya Federal ji bo zarokênd Kurd hinbûna zimanê dayikê, perwerdegariya bî zimanê kurd, ama-

dekirina metariyal û weşanen kurdi ji bo zarokan, tu mecal û imkan nedane efrandin û amadekirin. Ev serêşî dijwari û problemana iro ji dajon. Elmanya Federal ji wek hukmeta Turkiyê dixwaze zarokênd Kurd ker-lal biminin, mêjûyê wan bê şuştin xwenasi û şaxsiyeta wan pêşva neçe.

Jî ber vê politika şaş, xellet û çewt, bî destê KOM-KAR'ê li Elmanya Federal ev çend mehin kampanyeke fireh hatiye vekirin. Heta niha bî sedan rêxistin, parti û kesen bî nav û deng piştgiriya vê kampanye kirin, alikariya xwe nişan din. Daxwa-

za bingehin "Ders Bi Zimanê Dayikê Bo Zarokênd Kurd" ye. Bi saya vê kampanye pîrsa perwerdegariya zarokênd Kurd û hinbûna zimanê Kurdi li Elmanya Federal iro bûye pirseke rojane (aktuel).

Disa di rojê 13-14 Tebaxê da li bajarê Munihê civina Mamosteyênd Kurd pêk hat. Dî vê civinê da qasi 30 mamosteyênd Kurd besdar bûn û gelek ji Elman di civinê da besdar bûn. Di dawiya civinê de, ji bo cihanina pîrsen perwerdegariya zarokênd Kurd 12 bîryân bingehin hatin girtin.

## Deng û Behş Jî Australyê

Melbourne: *Di zanineha Melbourne da, rojê 16 û 17 ê meha Tebaxê, konferansê akademik li ser Rohilata Navin pêk hat. Di konferensê da, ne tenê mîvanen ji bajarênd Australya lê hin mirov ji welatênd wek New Ziland, Pakistan û Singaporê ji besdar bûn. Şahinê Bekir û Mehmûd Baksi, mîvanen Komela Kurdênd Australya, di konferensêda peyivin û rewşa Kurd û Kurdistanê ji mîvanen konferanse ra dan kifş kirin. Radyo ya Australya ABC hevpeyvinek bi Mehmûd Baksi û Şahinê Bekir ra li ser doza Kurdan li Kurdistanê, Europa û Australya û konferensa li bajarê Melbourne pêkhati çê kir.*

Canberra: *Lî paytexta Australya şevek piştgirtinê ji hêla Komela Kurdênd Australya û komitiya Canberra da hat organize kirin. Nêziki 300 mirov di salona Finnish Australian Club da besdar bûn.*

Endama parlamento Rose Kelly, serokwezir bob Hawke a hukmata Australya temsil kur û peyivi. Berêz McMullen, sekretêrê LABOR PARTY bî navê partiya xwe peyivi. Berêz Phillip Ruddock, séya wezirê Muhabiran, bî navê partiya Liberalan peyivi; û senator Don Chipp, serokê partiya De-

moqratan bî navê partiya xwe. Senator Chipp di axaftina xwe da ji hukmata Australya xwest ku ew mesala Kurd û Kurdistanê bibe Koma Netewan. Berêz Chipp got, ku hukmata Australya ji tırsa Amerikaya Yekbûyi newêre. Ew şermek mezine, fot Senetor Chipp, ku gelek azadixwaz û fêde wek gelê Kurd bo xatirê stasyonên Amerika û NATO yên leşkeri weqa tade û zordariyê bixwe. Paşê berêz Dunn ji Amnesty International peywi û got, ku gelê Kurd di welatê xwe da ne grûbek biçûke; ew neteweyek mezin e; gelek ji 20 milyonan bêtir e û mafê wi geli heye di Kurdistanêne serbixwe de biji. Mahmûd Baksi di gotina xwe da da xuya kirin ku kesek ne dikane di çayxanan da welatê xwe rizgar ke; dive gelê me êdi rewşa xwe derxe sehneya navnetewi û mesala xwe di şevêñ wisa da bine holê. Şahinê Bekir got ku, welatênd Roava da rojênd iro ji mesala Kurd û Kurdistanê di bin meselên din da hiştine.

Sydney: *Di êvara 21 ê meha Tebaxê da seminerek li ser Kurd û Kurdistanê bî alikariya Dr. Michael Humphrey li zanineha Macquarie cih girt û ser rewşa Kurdan axaftin bûn û belavok hatin belav kirin.*



## DINYA QEDER AXIRET

H.ŞARWÊRAN

Xızan bû, nezan bû. Dî nav tuneyê da derbaz kırabû emrê xwe. Awirê çevê wi , çiz-xiyê eniya wi jiyanâ wi dîda xwendin. Kopbû, dîkuliya. Kopalê wi dî destâ da sibê heyâ êvarê li nava gund da dicû û dihat. Betali û xîzaniyê ew xistibû nav rewşekê dijwar. Yek bilind û gîrs bû. Leqê ki dibûya dî nava gunda da jêra gotinek bigota. Çi qenç, ci xîrap. Sedem ku bela wi nekeve pesira kesi, her kes jê direviya, bî taybeti keç û bukê gund.

Mercên dijwar, jiyan jî Hîhemedê Helim ra kîribû zîkûm. Jî kîrasê bedena xwe aciz bû. Bi navê diya xwe dahata naskîrin. Ev jî li xweşê wi get nedîçû. Gelek tişt ditibû dî jiyanâ xwe da. Rewş û mercên dijwar pîr tişt anibûne serê wi. Dî dawiya emrê xwe da piçêk çelikandi bû. Bir û baweriyê oli ku dî xortaniya wi da hebûn êdi kembûn. Car-caran serhidi da jî xwedê ra, diji wi derdiket, bî qir û hawar. Lî gava dikete tengasiyan xwedê diketa bira wi. Sedem ev bû ku gundiyan digot: "Mîhemedê Halimê din bûye". Hinêk jî sedem ew bû ku, xwe jê diparastan.

Disa rojeke ji rojan xweş bû. Tav û germ bû. Ax jî bin berfê, dar û kuliilk jî bin sermê û seqemê nûh xîlas bibûn. Mera-mera berx û karikan bû. Bahara rengin xweşî û bereketa xwe berdabû ser jiyanê. Însan mina mêsên hingiv dicûn û dihatin.

Mîhemedê Halime jî mala xwe derket, weka her rojan. Lî nav gund gelek geriya. Piştî hat li ser sergoyêki rûnişt. Noqi xeyala bû. Dî berxwe da jî hêdi-hêdi sitran dîne-wirand. Jiyanâ wi weka şeritêkê dî ber çevê wi ra derbaz dibû. Dî nava xem û xeyala da dengêk hate guhê wi. Dengeki bilind bu û jî dûr va dihat.

— Dinya ...

Mîhemedê Halime veceniqi. Guh da vi dengi. Na, deng hate birin. Kes ji xuya nake, li nêzikayê. Şîl bû, rîcîfi, tîrsîya, xwin lê sar bû, guh lê belbûn. Her dîvê rewşê da dengêk di hat:

— Qeder !....

Mîhemed, zêdetir şîl bû, yekcar bîzdiya. Rewşa wi, bê olbûna wi, hate ber çavê wi. Mîrîn kete bira wi. Tinazker û yaribaz bû, lê baş dizani, mîrîn tişteki heneki nine. Sedenêmê vê jî, jî mîrînê ditîrisiya. Jî qeder û qiyamettê gelek sawdigirt. Piştî dengê dîdûya xwin li bedena wi sekini, weke tura dileriziya. Hêdika jî ciyê xwe rabû, qopalê xwe ber xwe, ber bî malê va meşîya, û kûr kûr difikiri ya:

— Willehi temame, ev car bî rasti xezeb li mîn dîbarê. Xwedê disa celladê xwe şandîye. Diyare dora "mal xîrakîrinê" ya mîn e. Hebi-tunebi ev dengê Ezrail in û bîmîn dide sehkîrin. Ez herim qe nebe li mala xwe bîmîrim.

Ü bî vê tîrs û xofê meşîya. Hê qasi bist gava neçubû dengêkê dî qamê Mîhemedê Hêlîme şikand. İdi bî tevayı bê hêz û tewş bû. Şaş bû, gêj bû.

— Axiret !....

Dî nav vê tîrs û xofê da xwe çawa gihiştande mal nîzani ya. İdi qet jê ra şik û guman ne ma. Baweri jê ra çêbû ku, belê roja wi a dawiyê ye Sedi-sed iro wê bîmîre. Pîr jî gunehê wi hene. Gelo wê çîbîke? Tê dî qebra reş û tarî da çawa bîsizire? Bî hile hil xwe avête şipaneka derge û li wê ma. Reng lê sıpi bû, xwin jê hatibû kîşandin. Lîvîn wi li ser hev nedisekînyan. Diranê wi li hev diketin. Bî dengeki sawgirti gazi maliya xwe kîr:

— Zimro, Zimro, keçê Zimro !... keça kûçîka lê Zimro, tu li kuyi?

Hêja bersiva xaltîqa Zîmrê ne standibû, bî qir û hawar disa bang kîr.

— Zimro, Zimro keçê zu were, melkemot li du mine, iro ezê bîmîrim. De were avê jî mîn ra germ bîke, lezke bilezine... ezê destmêjekê bigrim, serê xwe bîsîom, bîla bî bedenâ nîcîs va nemîrim. Cîlikê mîn ji bîne, cilê ber bin hemu pisbûne. Dê, dê lezke!...

Zîmrê tê negîhişt. Fêm nekir ka mesele çiye? Emreki dur û dirêj bî hevra derbaz kîr-bûn. Şîrikê hev ê xîzani û belengaziye bûn. Dî xortaniya xwe da xalê Mîhemed gelek tîrs û xof xistibû ser xaltîqa Zîmrê. Lî dî dawiya emîr da ev piçek kêm bîbûn. Zîmrê zûzû hate der û jê pîrsi:

— Xwedê xérke. Çiye disa, kezeb peritiyo. Tu çi dixwazi? Fehş bûyi, din bûyi, tewş bûyi, çi bûye ji te? Piçêk lî mala xwe rûnê. Bila hinêk hayatê ji din û diyana te hebe, dua bike, piçêk aqlê xwe bide serê xwe. Xwe wuha beredayi neke...

Xalê Mihemed şiretta dî nivi da hişt û go:

— Na, na Zimro. Ev car idî raste, direw nine. Guh bide min, ka çi hate serê min. Gavadin ez li ser sergoyê Rizo runıştibûm, hayê min ji tiştêk nebû. Ji nişkeva li ser hev min sê deng bihist. Ji kur û dur va dahatin:

— Dinya!..

— Qeder!..

— Axret!..

— Ez baş dizanım ku ev hersê din ji nurbari bûn, ne weki dengê beniademiya bûn, Ev dengê melkemota bûn, li gel min qise dikir. İro wê rohê min birtine, gelo ez karim çibikim?..

xaltika Zîmrê demeke direj li gel mala şêx qervaşı kırıbû. Her kes lê keça şêxa nasdıkir. Xale Mihemed vi meziyetê, Zimre ani bira xwa û careke dî pêva zare zarkir:

— Here Zîmzo, gelo ciyêkê ku, xwedê û ezrail li we tîne li van dera ku ez herim, xwe livê veşêrim û xîlas bibim?.. Tu şexi Zimro, belki tu dizani ciyêkê wuha. Ku tu dizani bextê te ketime, ji min ra bêje...

Zîmrê pê keniya û dest bî qisekirinê kiri:

— Xwede belayê te dayi. Ha wusan, ha, aqlê xwe bine serê xwe û sawa xwedê û pexember bike, siyaneta wan bigre û qedrê riza nişanbide. Dinya beredayi ye, mirin qeder ra me hemiyane, ya gîring axretê. Dî dinya ye da dive em hemu ji bona axret û selametê bixebeitin. Ü li benda qeder ra xwe bin.

Xalê Mihemed guh lê nebû, ew di derdê xwe da bû. Dî halêk da ji dî fikiriya:

— Raste Zimro jina min ya ewil e, her tişt dizane.

Inca Xalê Mihemed bî dengêkê nerm û tavanbar lavakir:

Zimro bexte te ketime, idi tu iro ji min xîlasdibi, qet nebi iro, bî xebera min bike. Dê zuke, ava min germ bike, cavêkê paqîj peyda bike ku li min bipêçin, dixwazim kefenê min germ û paqîj be. Xeberê ki ji bîde mela Salih bîla bê, li ser min çend ayeta bixwinê. Ev dengê ku hatine guhê min ne dengê xêrê bûn.

Dî nava van axaftına da ji ev deng dî serê xalê Mihemed da diciün û dihatin. Xwin lê dîtevzandin. "Dinya!...Qeder!...Axret!.....Dinya!... Qeder.... .... .

Xalê Mihemed carekê din bî dengêkê hêdi û tîrsonek,

— Dinya.... Axret.....Qeder... got.

Zîmrê dî bin de lê dikeni û kur kur temaşa wi dikira.

Xalê Mihemed:

— Dinya min xîrabû, min gelek kul û derd û nerihetiya kişand. Av tişt hemu qedera min bûn. İro ji vaye wextê min, roja min, qedera min hatiye û êdi ezê bimrim. Ya bî xér ji ba xedê... ka bizanım wê axireta min çawa be? Xwedê tu min bibexşini, dizanım ez pir gunehkarim, min bîde xatirê evdên xwe yê qenç.

Belki yekem car bû ku ji dil û can Mihemedê Halime, bî rasti û bawerkiri, ji xwedê ra dua dikir û ji bona xwedê lê bibexşinê, hivi û lava-lav dikir.

Zîmrê, wextê vi halê perişan û pir xîrap dit, guneha wê bî xalê Mihemed hat û dev ji pêkenine berda û rasti yê jê ra got:

— Dê were jorê were. Ev dengê ku tu behs dikî, ev ne dengê Ezrail bûn. Ezrail kise nake. Meriv dengê xwedê û Ezreil tucar nebihize. Tenê pexemberê xwedê van dengan nas dîkin. Ev deng dengê xwişka Emine bû.

Ev qise, kêmeki dilê xalê Mihemed honik kîr. Lî disan, bî tevayı bawer pê nekir. Pîrs li pey pîrsê, şik li pey şikê hatine bira wi, meji yê wi tarumar bû. Ji guman, xwin û xeyala rizgar nebû bî carêk, fîkrê nûh jê ra peyda bûn:

— Dinya, Qeder, Axret, Emine, Xwedê, Pexember, Melkemot...?

Dî nava vê rewşê da Zîmrê carêkê dîn dest bî qisan kîr û got:

— Baş guh bîde min. Sê keçê Emine hene, bî navê : Dinya, Qeder û Axret.

Xalê Mihemed gava ku van nava bihist, disa recifi û reng avêt.

Lê Zîmrê dom kiri:

— Mala Emine ji li bin destê rê ye. Ca çi mirin, çi melkemot û çi hal? Bê guman Emine bangi keçê xwe kırı ye, te ji bîhistiye û jê tırsiya yi. De were hinek avê û vê şerbeta şekir vexwe. Ezê ji harım, gazi xaltika Gulê bikim bila bê tırsa te bigrê

Pıştı van gotinan, reng û ruyê Xalê Mihemed xweş bû, dil nerm bû, maçıkên wi sor kırın, xwin lê geri ya. Lê da çu jor, şerbeta xwe xwar, kete nav nivina û raz, dî xwevda ço.

Xalê mihemed ji wê rojê û heya dawiya emre xwe, qet idî bî aliyê mala Emine ve neço. Ev zabox jê re bû sav, çevreşi avête wi goşe yê gund.

Ev bûyer li gund eşkere bû û tim gundi gava Xalê Mihemed diditan dî bînda dikeniyan.

Vêga xalê Mihemed çuye heqiya xwe. Dînya, Qeder, Axret ji bûne bûk, bûne dayik û xwedan zarù. Lê hêja ji ev hersê dayik li ku laqê gundiyên siserê ra dîbin Xalê Mihemed tê bira wan.

# DU EVSANÊ KURDI

— KUMREŞİ —

TOSINÊ REŞİD

Lê bî Adem dinê şen nebû. Evina dilê Adem nesot, hizretê cenê wida hêlin nehûna, ceger nebû zar û bî dengê xwe dinê tiji nekir.

Ü binaya çava parxaneke Adame çepê derxist, ji wê Hêwa çekir. Jî parsya mère çep jin sêwirand. Tevi jinê xweşiki û canikayi sêwirandin, weki dildari li dinê bibışkive, weki dengê zara bibe sertaca sırus-tê.

Lê Hewayê seri Adem nekir.

Hêwa çûre-çengel, çavê mina esmanê havinê sayi û hêşin, gerdena qerqaş-berfa belekiya, zîlfê zer-simlê genimê ghiştî.

Ü Hewayê seri adem nekir.

Ademi esmer û nivçe, pozi giri berani, çavê reşe kûrda ancax jî nav birû bijangê six dihatne xanê.

Ü Hewayê seri Adem nekir. Dî evina dilê Adem da kulilk dabû, wê nebû xemil, aqîr alava Adem dişewitand dilê Hêwayêyi bê hesin germ nekir.

Binaya çava disa kete nav xem û mitalla. Nêt û meremê wi nehatne sêri, beniadema ewi bî xwe jî parsiya Ademe çepê sêvirandibû, gura wi nekir. Ü xwedê vê carê horya canike xweşik, stiya Hem şand, weki Adem ra jintiyê bîke, jêra zara bine, dinê şenke.

Rojekê ji, beri êvarê gava pey firavinê ra Adem ketibû xewa şirin, Hêwa çû beravê. Devê çêm kuçkê xwe dada, dest bî şuştina kînca kir. Üsa serê wê berda, nişkêva yek ber sekini.

-Roja te xêr, xuşkê, -sitya Hem bû silav dayê. Hêwayê serê xwe bilind kir çi bîvinê, jin nine husul - cemaleke. Dîvê ro-yê tu derneyê, ez derêm.

- Ser çavara hati, - Hêwayê silava wê vegirt.

-Xûşkê, tu nizani gelo Adem li kuye?

-Maldaye, çira pîrsa wi dîki?

-Binaya çava ez şandime, weki Adem ra jintiyê bîkim.

Ser van giliyê paşin çirkin dilê Hêwayê hat, demeke kurt da hezar û yek tişt na-va mejûyê wêra hatin û derbaz bûn. Heveki tevhîvbûyi ewê got:

-Adem razaye, tu vîra rûnê, ezê herim

hîşyarkim, paşê tuyê bêyi. Hêwayê hema pê mêzara ber xwe destê xwe ziha kîrin û berbî xani çû.

Eva yeka tu cara bira wê ra derbaz nedibû, weki yeke dinê dikare bê Adem ra bîbejin, tevi wi dinê şenke.

Deri hêdika vekir. Kuleka xanira tirêjê tavê ketbûne ser çavê Adem, çend zipkê xûdanê ser enya wiye qemer diçûristin. Hêwa bê deng nêziki wi bû, ber serê wi rûnişt, serê wi hilda da ser çoka xwe, bî destmala xwe xûdana enya wi paqîj kîr û bî dîlovani enya wi mîzda. Adem hîşyar bû, çavê xwe vekir û metel ma, beşereke nazik ser lîvê Hêwayê diçîlvili, çavê wêye heveki şêluda hisreteke bê bîni şax vedabû.

-Evda xwedê, -gili devê Adem da ma. Hêwayê destê xweyi biçûk da ser devê wi û nehişt gotna xwe temamke.

-Ez te hîz dîkim, -serda xurici û bî lîvê xweye germ enya wi ramûsa. Adem destê xwe stuyê wêra bir û hev hemêz kîrin. Demekê şûnda Hêwayê serê Adem jî xwe dûr xist, bî çavê jî hêstra şîlbûyi zûr bû wê ni-hêri û kelogiri got:

-Roj û rewşa mîn, tenê bona te ezê çav û bûrya kîldin, kezi, gulyê xwe tenê bona te ezê hînakim, gulava bînxwêş porê xwe werkim. Lê dilê mîn bûye hêlinâ tîrsê, xemek nahêle ez bextewarbim, nahêle mina beybûna dev zanga ber te bibîşkîvîm, -bû kûrinya wê serê xwe da ser singê Adem. Adem serê wê singê xwe va guvaşt, porê wê ramûsa û got:

-Bêje delala mîn, bêje, ezê xemê dilê te gîşka belakim, jin û giyana xwe jî ez bîdim, yeke gerekê te bextewarkim, Hêwayê serê xwe bilind nekir.

-Tîrsa mîn ewe, tu yeke dinê hîzbîki, rasti yeke dinê bêyi û mîn bir bîki. Ü tenê hîşret bî mîn ra bîbe heval, evin alaya dilê mîn da şaxvedaye, weki vê dinê şenke, tek dil hînavê mîn bîşevitine.

-Hêwa, dilbera dilê evindar, ne ez çend sala bîndi vê rojê, bîndi vê demê mame, ne ev çend sale tenê bêxami û avryê te xu-re mîn bûne, û niha gava evê bihara xeml û xêz wergirti tu tevi mîni, rabim ser te ra yeke dinê hîz bîkim, rabim ser evê canika-

ya te ra seri jineke mayin bıkım. Na, tu cara nabe, bira dest te da ad û qirarbe.

Hêwayê disa dêm sûretê wi dane ber ramûsana û hêdika got:

-Ax, delalê min, qet nizanîm weki tu ser min ra yeke dinê hız biki, ezê ci binme serê xwe. Lê rasti eger tu min hız diki, eger dixwazi te bawar bıkım, were destê min da niha sond buxwe, weki xêj ji min tu jina ra tuyê seri daneyni.

-Bira xêj ji te jin min tobebîn, ez destê te da ad qirar dîkîm, weki hetani rojekê hebim, tek bona tebim, -Adem destê wê hilda nav kefa destê xwe û hêdika guvaşt.

Dilê Hêwayê idi hêsa bû.

-Pi, hindik mabû bira min biçüya, keçîkek hatye pirsa te dike, -Hewa ciyê xwe rabû, -de tu rabe ser xwe, ezê ji herim, ga-zikmê.

Adem ciyê xweda rûnişt. Tê bêji eva gişk xewn bû û wê disa betavebe.. Lê hema wê demê deri vebû û Hêwa tevi Styâ Hem hate hundur. Styâ Hem slav da Adem û paşê gotê:

-Binaya çava ez şandime bîvme kevan-ya mala te.

-Ya binaya çava ser çava, ser sera, lê e-zi idi zewcime û min ad qirar kîrye heta ez xweşbim, xêj ji Hêwayê idi tu jina nekim.

Styâ Hem Adem nihêri, Hêwayê nihê-ri û bê xatırxastin ji mala wan derket.

#### ----- A WAZÊ JÎNÊ -----

Û roja hevta, gava binaya çava idi din-ya gişk sêwirandibû, av û reşayı ji hev cihê kîribûn, erd û esman ji hev dûrxistibûn, hiv û roj çêkîribûn, avêtibûne rûyê esman, ewi xast meriv ji hebe.

Ewê xast meriv ji hebe, weki ci xwedê kêm hîştibû, ew tamke, ci ji xwedê ra li hev nehatibû, ew bîqedine, ci ji zevta xwedê der bû, ew bine sêri. Weki bibe xem-la dînyayê.

Û xwedê bî qîlxê xwe, bî dêmê xwe ji xwe qalip çêkir û hukum kire ser ruh, we-ki berda bê.

Lê ruh nedixast. Ewi lava dîkir, dîgot: "Ezê ber qalibda bêm, qalibê bîve meriv, sibê hezar qenci-xirabyê bîke, têkeve nav hezar şer û şiltaxya, paşê ji xwera bîmre here, êzê bersîva her tiştî bîdin".

Xwedê guh nedîda lava, dileka, ew disa ser gîlyê xwe bû. Ewi gef li ruh xarin, xast bitirsine, lê tişte dernediket, paşê ber dilê wi da hat, lê disa bê feyde bû.

Hîngê binaya çava gazi her hevt mîrê diwana xwe kir û ew şandne qalib, qe na ewana bî hunurê xwe, teherekî ruh bixapi-nin bîbne qalib.

Lê ruh lingê xwe kîribû soleke teng û tu fen fêla bawar nedikir.

Û binaya çava disa kete nav mitala, roj û şev kîrne yek, bira xweda hezar û yek fen cêribandin û dawyê çarê dit.

Ewi hukum kir qalibda def şîvyê lêxin.

Û nav qalibda def şîvi lêdan, dengê sazbendiyê çarnikal bela bû, awazê jindar ciya û bani, beri û beyar tev hildan, ava bi wi awazi kir xuşin, baz û çivika bi wi awazi stra, ciya mil kutane milê hev û bin wi awazida govend girtin.

Hetani kevrê kelebesta ji, ji ciyê xwe liviyan.

Ruh ji tap nekir, sazbendiyê ew ji ser-dapê zevt kîribû û idî tabeti nediketê. Bêyi hemdê xwe ew ji ji ci livya, pêşyê hêdi-hê-di, paşê çiqas diçû, ewqas lez berbi wê derê çû, ji ku dengê sazbendiyê dihat. E-wi her tişt birkîribû, qalbê ku nedixast he-re nav mervê, ku wê paşê hezar qenci û xi-rabi bîkîra, her hevt mîrê diwana xwedê, ku dixastin wi bixapinin. Ewi heta binaya çava ji bir kir.

Lî hevt tevekê erdê, heta hevt tevekê esman tenê ew awazê jindar mabû.

Gava ewi idi ranêzikayi qalib kîribû texmin kir kuda diçê, meşa xwe sist kir, xast paşda vegere, lê ber teql û zerpa saz-bendiyê tap nekir û çû hundur.

Qalib zêndi bû, bû mervê pêşin, bî qîlxê xwedê, bî dêmê xwedê, weki ci xwedê kêm hîştibû, ew tamke, ci xwedê ra li hev nehatibû, ew bine sêri, ci zevta xwedê derbû, ew bîqedine.

Weki dinê şenke.

# JI NAV WEŞANAN

## "DAWIYA DEHAQ"

"Dawiya Dehaq" ku wek teatir bî aliyê Kemal Burkay hatibû nivisandin û dî kovara Özgürlik Yolu (Riya Azadi) da hatibû neşirkirin, vê dawiyê li Iraqê dî kovareke edebi ya Kurdi da ku bî navê BEYAN derdikeve, ji nuh va hat neşirkirin.

## "KURDISCHE VOLKSTICHTUNG"

\* Çend nivisarê Thomas Bois li ser Helbestêr Kurdi yêñ Geleri yêñ ku dî navbera salêr 1945 û 1946'an li Beyrutê hatine weşandin, vê carê ji aliyê Instutiya Kurdi da ji nû va hatin çapkirin. Pirtük bî zimanê Elmani derketiye û navê wê "Kurdische Volksdichtung" e.

## "SVENSK KURDISK JOURNAL"

Li Swêdê kovareke bî navê "Svensk - Kurdish Journal" hate weşandin. Kovar ji Aliyê "Komela Çandi Swêd-Kurdistan" derdikeve. Heta niha du hêjmarên wê derketin. Dî vê kovarê da li ser çand, huner û edebiyeta kurdi bendêr dirêj û deng-bahsêr nû cih girtine. Zimanê kovarê tenê swêdiye.

## "PIRTÜKEN ZAROKAN"

"Çapxana Çanda Kurd" li Swêdê heta niha cêrgek pirtükên zarokan yêñ bî nav û deng, ji zimanê swêdi wergerandine ser kurdi û çapkirine.

Bî çapkirina van pirtûkan "Çapxana Çanda Kurd" literatura zarokan dewlementur kur.

\*Keça Şerût Lotta

\*Ma Tu Tırsoneki Alfons Oberg?

\*Pippiya Goredirêj

\*Belê Lotta Kare Bajo

\*Binêre Madikan Berf Dibare

\*Ki Alfons Rizgar Dike?

Çendek ji van pirtûka nin.

## "MİLLÎ EDEBİYATLAR VE EDEBİ ELEQELELER"

\* Beri çend mehan pirtûka Kinyaz İbrahim ya nû bî zimanê Azerbeycani hate weşandin, navê wê "Millî Edebiyatlar ve Edebi Elekeler" (Litteratirêr Netewi û Pevguhaztinêr Liteteraturi). Pevgirêdan û pêwendiyen litteratura Kurdi li gel litteratura netewêr cinar çine? bersiva vê pîsê, dî vê lêgerinê da hatiye dayin.

## "KILAM Û STRANEN ME"

Ji aliyê Komela Karkerêrê Kurdistan li bajarê Bremen (Li Elmanya Federal) berrevokeke stranêr Kurdi hat weşandin. Ev berevoka bî navê "Kilam û Stranen me" ji aliyê H. NAVDAR da hatiye amadekirin. Dî nav rûpelêr berevokê da 115 Stranêr Kurdi cih girtine.

## "FONETİKA ZIMANÊ KURDİ"

\* Li Leningradê pirtûkeke gramatika zimanê Kurdi ji aliyê Instututa Zimanzaniyê da hat weşandin. Ev Pirtûka bî navê "Fonetika Zimanê Kurdi" (Zaravê Mukri) bî destê zimanzan Y.A.Smirnova û K.R.Eyübi hatiyê amadekirin.

## "STRAN Û SERPÊHATIYÊN KURDİ"

\* Pirtûka Heciyê Cindi "Stran û Serpêhatiyêr Kurdi yêñ Epiki" ya ku dî sala 1962 li Moskovê bî zimanê Rusi û zimanê Kurdi derketibû, ji aliyê Memo yetkin da, li Stockholmê ji nû va derket. Memo Yetkin pirtük ji tipêr kirili wergerandîye tipêr latini, wi wusan ji pêşgotinek ji pirtûkê ra nivisiye.

## "KEFERAT"

Bî navê "Kêferat" pirtûkeke helbestan hate weşandin. "Kêferat" diwana Salihê HEYDO, ya yekemine. Bî kurdiyeke zelal û bî tipêr latini hatiye nivsandin.

**30 sal berê dest bî weşanîna bernameyên kurdi kır**

## RADYOYA ERİVANÊ



Gulizera CASIM



Keremê SEYAD



Lusiya HUSEYİN

Ev nêzkaya 30 saliye Radyoya Erivanê weşanên xwe bî serfirazi berdewam dûke.


Çawa tê zanîn ev radyo dî sala 1957'an da dest bî weşanên xwe kîriye û heta roja iroyin ji weşanên xwe dîdomine. Radyoya Kurdi iro rojê du caran qasi seet nivekê bî zimanê kurdi programên hêja diwe-

şine. Çawa lî Sovyetistanê wusan ji lî her çar besên Kurdistanê ev radyoya dikare bê guhdarkirin. Bî saya Radyoya Erivanê, gelê me bî salan lî ser çand, zîman, huner û nûçeyên teze agahdar bûye, hertim guh daye muzika Kurdi. Radyoya Erivanê bî rasti iro bûye navenda muzika Kurdi. Lî jor çend peyvka-rê Radyoya Erivanê têx xuyan.

## PIRTÜKEKE NÛ



Di nav weşanên Roja Nû da, bî zimanê Turki pirtükkeke nûh li ser pîrsa perwerdegarîya zarokêñ Kurd derket. Navê wê 'Prosesen Perwerdegariyê Lî Kurdistanê' (Kurdistan'da Eğitim Süreçleri). Pirtük ji aliyê ROHAT'da hatiye nîvisandin. Pîrsa perwerdegarîya zarokêñ Kurd li Kurdistanê, li Ewrûpa û li Yekitiya Sovyet da, dî çi rewşêda ye, dî vi wari da çi kar têx kîrin, problem û serêşî çine, wek van pîrsan bersiva gelek pîrsen mayin ji bî çaveki pedagojik dî pirtukê da hatine şirovekirin.



BIHA: 10:- kr.